

# Qadir Moti



# MENAL, DIL

**Qadir Motî**

**MENAL, DiLO**



UniPrint  
Bakû-2007

Rêdaktorê bersîvdar: Ahmedê Hepo

Korêktor: Fexreddînê Muzeffer

Tîprêz: Herdu bira Mesûd û Selaheddînê  
Barzanî

Ev berevoka ku, radestî xwendevana  
dibe helbestên helbestvan Qadir Motî yêñ  
bijarenin.

Bila rîya wê jî bibe rîya bijare, nava  
xwendevana da bê hizkirinê, nava wêjeya gelê  
kurd da cîyê xwe bigire.

742001007  
M \_\_\_\_\_  
080-2007

© Qadir Motî

## ÇAVKANÎYA ZELAL

Helbestên, ku ser sewt-awaz-miqamên gel têne efrandinê ew rê dibînin û dilê her mirovekîra derbaz dîbin. Eva destanîn, serfinîyazîke bilinde. Lê ew nabe qismetê her efrandarekî. Ji ber ku, gotî ew kes ji roja şidiyyayî-şidiyyayî rê diçe, jîyanêda hey bi dil û hestên xweva gelra gavde. Şayî-şîna wê, qencî-xirabîya wê, derd-kul, jan-êşa wê ya xwe bihesîne û wan gişkan nava xwîna dilê xwera derbazke, wê demê çavkanîya efrandar bî paqîş û zelal dibe.

Ev yek helbestvan Qadir Motîra li hev hatîye. Rastî jî gava seranser dikevî nava efrandariya helbestvan dixûnî, dibînî ewî karibûye têkeve dîlana gel. Zulm-sîtem, rewşa gelê xwera kewgirîye, serketin-rizgarîya wêra şâ bûye.

Helbestên helbestvan mîna deste kulîkên reng bi reng, bîn bi bînin. Wanada nitrandina erf-edet, wetenhiزî, şerkarıya rîya gel ya bi sîyanet-serfinîyaz, hub-hizkirin, pêkenîn û siba roja geş, bawerî heye.

Çarenûsa wî mîna çarenûsa bi hezaran kurdan bûye. Lema ew bi kesereke kûr, bî dilbarekî giran dîbêje:

Rozgar xerab, bext razaye,  
Mital xar kir vê dewranê.  
Rev-bez, ax-zar bû para min,  
Dilêm sar kir vê dewranê.

Helbestvan qewmandinên gerdûnê, rewşa gelê

xwe, kirina neyaran rind derz dike, rind dibîne û birînâ  
dilê xwe ber xwendevana vedike:

Dilê meda ma hesret,  
Wek xulamê bê rûmet,  
Jî sed parî parek dan,  
Ew jî bi rik, bi kudret.

Helbestvan bi her alî dibîne çi bûye sêdemê  
bindestîya welatê wî. Ew wan tiştên kotî, paştamayı  
rexne dike û dawîyêda nêta wî ewe, wekî welatê wîyê  
rizgarbe û xwendevanê xwe ruhdar dike. Bona nêt bê  
makkirinê bendek ji helbesta «Hey Kurdistan »:

Seyranê te zîyaretin,  
Mêrg û çîman xweş-rehetin,  
Welat aza, def-dewatin,  
Bê minetî, hey Kurdistan.

Qadir Motî helbestvanekî lîrîk efrandîye.  
Lîrîkayêda hub-hizkirin usa hatîye nitrandinê, usa cî bi  
cî hatîye himberî hevkirinê tu heyr-hejmekar dimînî.  
Nexş-nîgarên xwezayê bi şêwazeke hevtrengîva tê  
nitrandinê. Motîvên sîyasî di nava lîrîkêda dihelîne,  
birîndar, hesretkêşen welêt wana xwera dikine  
melhem. Helbestvan bi bedewî nîgara jina kurd, keç-  
bükên kurdan dinitirîne. Ewana bi nav-namûsin, mîna  
zinar, zeran qayîmin, mîna çîya serbilindin, mîna avêñ  
kanîyâ zelalin, jîyanêda ji tu tîşti paşa namînin,  
hizkirfîyê hetanî roja qîyametêne, xûşkên dilşewîşîne,  
dayîkên stûnên malbetanin, azayî hizîn.

Beşek helbestên Qadir Motî mîna gezgezkê  
mirovân ditevzîne. Bi zimanê teyr-tûya, kûvîyan qersê

**WETENHİZİ,  
MÊRXASÎ**

xwe ewaran, neqenca, arûşan, nan pêpeskira û dexes-çavnebaran dike.

Çekeke efrandaran-ew zimane.

Ziman-nivîsandina helbestvan şirîn, zelale ji berku, ewî hê hêleçanêda ji çavkanîya zargotina gelê xwe lûrî, de lûrî, dilok, çîrok, kilamên bê jimar û beyt-serpêhatî bihîstîye, paşê wana di nava hiş-sewdayê wîda cîyê xwe girtîye.

Qadir Motî zelalîya zimanê dayîka xwe, xwera kirîye ruhê helbestan. Lema jî xwendevanan carekê helbestên wî xwendinê bîrêda yan dimîne, yanê jî ber xwe dibêje. Helbestên wîye usa hene her dengbêj dikare wana têke kilam-stran û bistirêن.

Dawîyêda ewê jî bêjin, wekî em bawerin helbestên vê berevokê wê travâ wêjeya gelê kurd da cîyê xweyi hêja bigirin.

Ahmedê Hepo,  
nivîskarê Kurd,  
Endamê Yekîtîya Nivîskarêن  
Azerbaycanê.

## KURDISTAN

Nabe wek te tu dîyar,  
Tim baharî Kurdistan.

Gulistanî, cinetî,  
Baxçe-barî, Kurdistan.

Lalezerin rastê te,  
Gul-çiçekin bestê te,  
Ling nabirin dostê te,  
Xweş cî-warî, Kurdistan.

Meşa kewa, xezalan,  
Ken-henekê delalan,  
Xweşhal dike bedhalan,  
Bê hinberî, Kurdistan.

Rêzên konan ber çîyan,  
Koz-guharê berx, mîyan,  
Bilqe-bilqa kanîyan,  
Nexş-nîgarî, Kurdistan.

Bazirganê bar giran,  
Ha têñ, diçin, sal, zeman.  
Tu wext nabî bê kewran,  
War tucarî, Kurdistan.

Ser serê te teyrê baz,  
Dora çema quling, qaz,  
Wek keç-xortê ber miraz,  
Kaw-kubarî, Kurdistan.

Cidir, beza kihêlan.  
Dengê zurna, diholan.  
Tîne zimîn ker-lalan,  
Tu bext yarî, Kurdistan.

Li Cizîrê nav Bota,  
Def-dewata keç-xorta.  
Xwezila min bidîta,  
Tu ruhdarî, Kurdistan.

Şukir pirre pezê te,  
Xelaz nabe rezê te.  
Ez heyvana nazê te,  
Naz nûbarî, Kurdistan.

Ser serê te mij-dûman,  
Naçe vebe erd-esman.  
Me nahêlî bê guman.  
Bi îtbarî, Kurdistan.

Gel, êl çûnê zozanê,  
Rojê şillî, baranê,  
Ji bîr nakin aranê,  
Bi pergarî, Kurdistan.

Jina sêpî mil danê,  
Meşk û nêhre kil danê.  
Bi pûtan rûn hildanê,  
Bi kar-barî, Kurdistan.

Teyrok bûnê dem-dema,  
Sûravêlkê dor çema,  
Xwe davêjin ber kema,  
War sitarî, Kurdistan.

Birqê şemal vedanê,  
Birûskê şûr lêdanê,  
Lêwîyê gund hildanê,  
Heyf bê çarî, Kurditsan.

Xulamê te, qûlê te,  
Dibin zêr, zîv, lelê te,  
Talan dikan êla te,  
Lema jarî, Kurdistan.

Ka Cegerxwîn, Goranî,  
Ehmed Xanî, Teyranî,  
Dûr dîroka dewranî,  
Bi hewarî, Kurdistan.

Serok pêşvan tev gelan,  
Barê giran ser millan.  
Bersiv didin ji dilan,  
Bi serkarî, Kurdistan.

Yeke wê bê ew seet,  
Kurdê bibin xweş dewlet.  
Qadir bêje geş-rehet,  
Azadarî, Kurdistan.

1980

## EZ DİÇİMÉ KURDİSTANË

Nêt- meremêm têne sêri,  
Ez diçime Kurdistanê.  
Derdê dilêx derman bikim,  
Ez diçime Kurdistanê,  
Rind mîzekim gulistanê.

Hezar sale bê rizgarim,  
Xwedan şehid, bi ax-zarim,  
Beden ser min dil çar parim,  
Ez diçime Kurdistanê.  
Rind mîzekim gulistanê.

Seddam bomba jerê avît,  
Kal, pîr, jin, zar, bûne şehîd,  
Welêt zulma ser zulmê dît,  
Ez diçime Kurdistanê.  
Rind mîzekim gulistanê.

Şer, dew, rev, bez, kela, kuştin,  
Bû para me, em bê piştin,  
Bav-kalê me bê war hîştin,  
Ez diçime Kurdistanê.  
Rind mîzekim gulistanê.

Beş-beş nebin îdî besse,  
Hev efûkin yekbin esse,  
Yektî nebe kurd bê kesse,  
Ez diçime Kurdistanê,  
Rind mîzekim gulistanê.

Yektîya me zarêmeye,  
Yektîya me zorameye,  
Yektî iro dorameye,  
Ez diçime Kurdistanê,  
Rind mîzekim gulistanê.

Yektî nebe qudret nabe,  
Yektî nebe welat nabe,  
Yektî nebe dewlet nabe,  
Ez diçime Kurdistanê,  
Rind mîzekim gulistanê.

Dilda nebe hesreta me,  
Bê xof bijî milletê me,  
Yekbe, tewbe dewleta me,  
Ez diçime Kurdistanê,  
Rind mîzekim gulistanê.

Barzanî û Telebanî,  
Gelê mera yektî anî,  
Me kurdanra dewlet danî,  
Ez diçime Kurdistanê,  
Rind mîzekim gulistanê.

Xwezla ew roj zû bihata,  
Welat temam min bidîta,  
Qadir Motî geş bigota:  
-Ez hatime Kurdistanê,  
Mêze dikim gulistanê.

29 gulanê, 2005-ê salê

## KURDNO, RABİN WAR DİÇE

Milletê me çend sale,  
Dest neyaran dinale.  
Nêt-meremêm li bale,  
Kurdno, rabin war diçe,  
Weten diçe, ar diçe.

Gund û bajar, best, beyar,  
Zeft kirîye har neyar,  
Jin, zar mane bê sitar.  
Kurdno, rabin war diçe,  
Weten diçe, ar diçe.

Sîyaseta me kurdan,  
Kê bela kir, kê der dan.  
Wana hemû dîyar dan,  
Kurdno, rabin war diçe,  
Weten diçe, ar diçe.

Pêşmergên me dûr çollan,  
Halet, tifing ser millan,  
Sekinîne ber gullan.  
Kurdno, rabin war diçe,  
Weten diçe, ar diçe.

Mil bidine millê hev,  
Şêwrê bikin ro û şev,  
Dew-dozada rabin tev,  
Kurdno, rabin war diçe,  
Weten diçe, ar diçe.

Şikestîye millê me,  
Şînê dike gelê me,  
Xwîn vedreşe êla me,  
Kurdno, rabin war diçe,  
Weten diçe, ar diçe.

Çêbûn, yekbûn, ulmê kûr,  
Rê-dirb, zanbûn bê qisûr,  
Pak dibire, ne kû şûr,  
Kurdno, rabin war diçe,  
Weten diçe, ar diçe.

Kurd mîrxase, kurd xase,  
Bê dewlete, be kese,  
Zulma me dît lo bese,  
Kurdno, rabin war diçe.  
Weten diçe, ar diçe.

Ew dewletê nav mezin,  
Ax-zara me dibîzin.  
Sînor ji wan bixwezin,  
Kurdno, rabin war diçe.  
Weten diçe, ar diçe.

Welatê me bi şane,  
Dayka mîrxas, merdane,  
Îro ji dest berdane,  
Kurdno, rabin war diçe.  
Weten diçe, ar diçe.

Çiqas şehîd me dane,  
Heyfa wana hê mane.  
Guman, bawar bal wane,  
Kurdno, rabin war diçe.  
Weten diçe, ar diçe.

Rakin dîyar, keç-xortan,  
Mîrxasên çê, bav xurtan,  
Berdin derxin dev rûtan,  
Kurdno, rabin war diçe.  
Weten diçe, ar diçe.

Mêrg û çîman, bax, bostan,  
Her der bibe gulistan.  
Ya kurdabe Kurdistan.  
Kurdno, rabin war diçe.  
Weten diçe, ar diçe.

Wexte dijmin bigirin,  
Vir-vizê wan bibirin.  
Yan dewlete, yan mirin,  
Kurdno, rabin war diçe.  
Weten diçe, ar diçe.

Piştä tenê xar-derze,  
Yekbûn mera pirr ferze,  
Dijmin lema nabhîze,  
Kurdno, rabin war diçe.  
Weten diçe, ar diçe.

Qadir, bêje helbestan,  
Boy xêrxazan, boy dostan,  
Zû azabe Kurdistan.  
Kurdno, rabin war diçe.  
Weten diçe, ar diçe.

## SEVA KURDA ZULİMKARİN

Şer-dew, rev-bez, berf û baran,  
Zeman kê kir mal me wêran,  
Wî welgare text û dewran.  
Seva kurdan zulimkarin.  
Lema kurdêm bê cî-warin.

Ferman dane hemû kesa,  
Destê wanda şûr û esa,  
Kurdan digirin davê qersa.  
Seva kurdan zulimkarin.  
Lema kurdêm bê cî-warin.

Kanî kurdî gilî-gotin?  
Xêr-bereket gişk firotin.  
Destê meda şiv-dar, cotin,  
Seva kurdan zulimkarin.  
Lema kurdêm bê cî-warin.

Herro, her şev, divêm dîsa,  
Rind bibhîzin deng û besâ,  
Darda dîkin kurd mîrxasa,  
Seva kurdan zulimkarin.  
Lema kurdêm bê cî-warin.

Gelî kurdan tev bigerin,  
Tev hilgerin, tev dagerin,  
Axa kara kurda xwarin-  
Seva kurdan zulimkarin.  
Lema kurdêm bê cî-warin.

Kurdistanam alîk bere,  
Alîk sore, alîk zere.  
Heyfê dijmin lê digere,  
Seva kurdan zulimkarin.  
Lema kurdêm bê cî-warin.

Kanî kurdî rewş û fesal,  
Hespa bi zîn, şûr û mertal.  
Li me birîn nedan mecal,  
Seva kurdan zulimkarin.  
Lema kurdêm bê cî-warin.

Xezna êlê maye kêra?  
Neftê dîbin, zér jî pêra.  
Herin bêjin dewletanra,  
Seva kurdan zulimkarin.  
Lema kurdêm bê cî-warin.

Welatê me beyar, beste,  
Berekete, bona doste,  
Bi ken mera dikin qeste.  
Seva kurdan zulimkarin.  
Lema kurdêm bê cî-warin.

Kurdistanam sor-geveze,  
Miletê min weten heze,  
Heyfê neyar lê dibeze.  
Seva kurdan zulimakrin.  
Lema kurdêm bê cî-warin.

Daykam nexwaş zare-zare,  
Hekîm tune, can bêzare.  
Bê dermane, ew bê pare...  
Seva kurdan zulimkarin.  
Lema kurdêm bê cî-warin.

Weynin karta Kurdistanê,  
Pak bibînin gulistanê-  
Bahar, payîz zivistanê.  
Seva kurdan zulimkarin.  
Lema kurdêm bê cî-warin.

Kurdan nake belengazî,  
Kî mîrxase bike gazi.  
Memûr, paşa yek jî qazî  
Seva kurdan zulimkarin.  
Lema kurdêm bê cî-warin.

Hêsrêm diçe weke çema,  
Birîndarim ji dil lema.  
Rind buxwinin wera tema,  
Seva kurdan zulimkarin.  
Lema kurdêm bê cî-warin.

Mîna berxê li dest guran,  
Par kirine bi çar paran,  
Dibe herek xweran-xweran  
Seva kurdan zulimkarin.  
Lema kurdêm bê cî-warin.

Aqilbendên kurdan kanê?  
Bê yekîtî lê dest danê,  
Bela kirin li rû dunê.  
Seva kurdan zulimkarin.  
Lema kurdêm bê cî-warin.

Kal-bavada kurd tew mère,  
Zeng nagire mîna zêre.  
Nenihêrin dijmin pire.  
Seva kurdan zulimkarin.  
Lema kurdêm bê cî-warin.

Zulma tarî mera bû par,  
Em bûn xulam û xizmetkar.  
Neyar bûne hevra dost-yar,  
Seva kurdan zulimkarin.  
Lema kurdêm bê cî-warin.

Kanê qewal, kanê dengbêj?  
Kanê dewat, kanê aşpêj?  
Kê li me kir, ewî tu bêj.  
Seva kurdan zulimkarin.  
Lema kurdêm bê cî-warin.

Hey Kurdistan, welat kanî?  
Dewletan lê sinor danî.  
Zeft kirine, çîya, banî...  
Seva kurdan zulimkarin.  
Lema kurdêm bê cî-warin.

Zimanê me welgerandin,  
Govenda me reş gerandin,  
Jin, zar, kal, pîr, tew qelandin.  
Seva kurdan zulimkarin.  
Lema kurdêm bê cî-warin.

Hemû kurdê dunê yekin,  
Pak bizanbin miletokin.  
Çavnebarîya hevdu nekin...  
Seva kurdan zulimkarin.  
Lema kurdêm bê cî-warin.

Kurdistanam tu hewarî,  
Şewqê bide çiyê tarî,  
Lêde, berdê, bi dil barî.  
Seva kurdan zulimkarin.  
Lema kurdêm bê cî-warin.

Kilît, mifta biqetînin,  
Mehbûsara xwe bighînin  
Ji zîndana wan derîn,  
Seva kurdan zulimkarin.  
Lema kurdêm bê cî-warin.

Lawo, rabe ne tu mîrî,  
Xiretêva xwayke sêrî.  
Dijmin bikin qûl û cêrî,  
Seva kurdan zulimkarin.  
Lema kurdêm bê cî-warin.

-Xortê êlê ra tesîbê,  
Bêjin bila Barzanî bê.  
Cegerxwîn jî zûva dibê.  
Seva kurdan zulimkarin.  
Lema kurdêm bê cî-warin.

Xurê me tim kul, derd, axin,  
Ax-zare me li dunêxin,  
Kurdistanê paşda nexin...  
Seva kurdan zulimkarin.  
Lema kurdêm bê cî-warin.

Rabin lêxin ev kar bese,  
Mala xweda kurd bê kese,  
Kurdistanê bibe ese!!!  
Seva kurdan zulimkarin.  
Lema kurdêm bê cî-warin.

Roja dijmin zor we anî,  
Bikin sitar, çîya, banî,  
Heta bibin ser dîwanî.  
Seva kurdan zulimkarin.  
Lema kurdêm bê cî-warin.

Tenê yekbûn mera xweše,  
Tev bigerin nebin şâše.  
Dijmin, neyar hinav kaşe-  
Seva kurdan zulimkarin.  
Lema kurdêm bê cî-warin.

Ez Qadirê Koroxlîme,  
Tenê hebe dewleta me,  
Serêm here nakim xeme  
Seva kurdan zulimkarin.  
Lema kurdêm bê cî-warin.

s.1980

## EM XULAMÊ BÊ PARİN

Bahar, payîz, zivistan,  
Ji bîr naçî Kurdistan,  
Ax-nalînya te rindê,  
Dil kibab kir ser bistan.

Xwedan dewlet, serkaran,  
Tu birkirin çar paran,  
Hildan mal-hal, best, beyar,  
Em hîştin ber dîwaran.

Em darpiştin, sitarin,  
Şivan, gavan, kardarin,  
Ked-heda me tew birin,  
Em xulamê bê parin.

Mêvan hatin mala me,  
Qet nepirsîn halê me,  
Malxî ji mal derxistin,  
Kul kirinê dilê me.

Me ava kir qesra xan,  
Ker, kor, kirin xwedan nan,  
Hesp, şûr, mertal me da wan,  
Em xwe manê bê gumana.

Mala meda kê nan xwar,  
Rojên dijwar nebûn yar,  
Rûyê meda kenîyan,  
Pişt me bûne gurê har.

Em olamin, kar ya wan,  
Barbir emin, bar ya wan,  
Em bar nebin yê lêxin,  
Serî ya me, dar yê wan.

Dilê meda ma hesret,  
Wek xulamê bê rûmet,  
Ji sed parî parek dan,  
Ew jî bi rik, bi kudret.

Mala meda zêr heye,  
Destûr destê mar daye,  
Ew dikirin, difroşin,  
Xwayê malê zûr maye.

Zevî ya me, deşt ya me,  
Hevîr ya me, teyşt ya me,  
Em nepêjin nedne wan,  
Şivdar ya wan, pişt ya me.

Sêwîyê ber destê me,  
Şikestandin şesta me,  
Me nan da kê mezin kir,  
Ew rabûne qesta me.

Kurêm yar pak şâ nekir,  
Keçam por eşq şe nekir,  
Welat ya me, mal ya me,  
Me xwe aza ba nekir.

Nîft ji erdê me derxist,  
Neyar bê ked şam vêxist,  
Daykam bedhal zulmêda,  
Wan nemerda def lêxist.

Ew nemamê bê îman,  
Birîn li me zar-ziman,  
Govend, kilam, qamê me,  
Dizîn birin way eman,

Halê gelêm girane,  
Êş wek jana dirane,  
Welatê me zû derxin,  
Ji dest hurç û gurane.

Boy van zulman, derd, kulkan,  
Mil bidine di millan,  
Welatê me aza kin,  
Ji xedaran, top, gullan.

Kî hez dike kurd şabin,  
Bi tifaq bin, tev rabin,  
Dijmnê me nemerdin,  
Tu car mera dost nabin.

Hev efûkin tişt nabe,  
Xedar mera pişt nabe,  
Azadarya me kurdan,  
Birê bira kuşt nabe.

Mehmed Qazî, Barzanî,  
Wana mera nav anî,  
Îro pêşvan-serokan,  
Gelra rêka nûh danî.

Bav-kalê me xas, hurrin,  
Esil, nisla me durrin,  
Em polane natewîn,  
Rostem-Zalê me pirrin.

Qadir bi ax dibêje,  
Îdî sêl nan napêje,  
Rind dizanin dîrokzan,  
Kurdê neyar bavêje.

## HEY KURDISTAN

Teberika kal û bavêm,  
Zar-zimanêm, tema devêm,  
Hîvam, tavam, nûra çavêm,  
Can cînetî, hey Kurdistan!

Tu dîroka pir dewranî,  
Cî-meskanê merd-mêranî,  
Mehmed Qazî, çê Barzanî,  
Şêr culetî, hey Kurdistan!

Çiqas qurne, dewran çûne,  
Gellek êpos, mîrxas bûne,  
Ker û Kullik, Sîmko dane,  
Tu yar, bextî, hey Kurdistan!

«Ser zinaran teyrê bazî,  
Dora çema quling, qazî,  
Wek keç-xortên ber mirazî,  
Nûh dewletî, hey Kurdistan!»

Zozanê te gulistanin,  
Berojê te daristanin,  
Her der zevî, bax-bostanin,  
Xweş welatî, hey Kurdistan!

Jorê berf û belekîne,  
Jêrê çem û çavkanîne,  
Rêzê konnan lê danîne,  
War şurbetî, hey Kurdistan!

Kûvî, xezal serê çîyan,  
Koza berxan, hoza mîyan,  
Bêrî, pezdoş, bêrîvanan,  
Bereketi, hey Kurdistan!

Kake-kaka kewgozelan,  
Ken-henekê keç-delalan,  
Xweşhal dike kal, bedhalan,  
Tu qudretî, hey Kurdistan!

Seyranê te zîyaretin,  
Mêrg û çîman xwes-rehetin,  
Welat aza, def-dewatin,  
Bê minetî, hey Kurdistan!

Xêr-bereket li bal teye,  
Qedir-qîmet li bal teye,  
Tore-terbet li bal teye  
Bi hurmetî, hey Kurdistan!

Helebçê pir şehîd daye,  
Daxa jerê scr daxaye,  
Heyfa wana hela maye,  
Neyar kotî, hey Kurdistan!

Kurd çar paran bir-bir kirin,  
Zîndan, kela lê pîr kirin,  
Jin-zar bê sûc tew qir kirin,  
Mar qismetî, hey kurdistan!

Barzanî û Telebanî,  
Wana yektî, rastî danî,  
Mera namûs, him nav anî,  
Bi xîretî, hey Kurdistan!

Bona hebe rûmeta me,  
Ji dil derê hesreta me,  
Tewbe, çêbe dewleta me,  
Tu taqetî, hey Kurdistan!

Qadir revok, him koçbere,  
Dilda keser, bi ax-zare,  
Pirsêm zefin welat dûre,  
Dil peritî, hey Kurdistan!

## RÊ-DÎRB

Dewran, zeman, waxt jî pêra,  
Rê-dirb birîn li me kurdan.  
Dîwan, ferman maye kêra,  
Rê-dirb birîn li me kurdan.

Çima tune dewlete me,  
Sînorê me, Welatê me.  
Bindest bûye milletê me,  
Rê-dirb birîn li me kurdan.

Dil çend para nabe guman,  
Îro heye çar Kurdistan.  
Kanî serkar, kanî pêşvan,  
Rê-dirb birîn li me kurdan.

Li her dere kurd feqîre,  
Belengaze, kurd hêşîre.  
Zindanada qîre-qîre,  
Rê-dirb birîn li me kurdan.

Xwezla rokê Kurdistanê,  
Kurd bibûya ser dîwanê,  
Minê bida can qurbanê,  
Rê-dirb birîn li me kurdan.

Qadir, şîn ket nav malbetan,  
Hêsîr, bê kes hîştin bestan.  
Dane qirê bi dewletan,  
Rê-dirb birîn li me kurdan,

## RABE, RABE ŞÊR BARZANÎ

Mêrxasê me Barzanîye,  
Rîya rastî wî danîye.  
Derdê kurdan wî zanîye,  
Rabe, rabe, mêt Barzanî!  
Li meydanê şêr Barzanî!

Kurdistanê bona kurda,  
Agir danê pêda-pêda,  
Te serwêrî daye kêda?  
Rabe, rabe, mêt Barzanî!  
Li meydanê şêr Barzanî!

Bêjin bavo, bêjin dayê,  
Bikin gazî, hewar, hayê,  
Heyfa dijmin li me nayê.  
Rabe, rabe, mêt Barzanî!  
Li meydanê şêr Barzanî!

Kurd mîrxase, bê tifaqe,  
Kî, razaye tu wan rake.  
Dilê akkard dîsa şake,  
Rabe, rabe, mîr Barzanî!  
Li meydanê şêr Barzanî!

Qasid herro caba tîne-  
Qira kurdan zef danîne,  
Halê weten derd û şîne,  
Rabe, rabe, mîr Barzanî!  
Li meydanê şêr Barzanî!

Kurdistanam zef bedewe,  
Lema dijmin dike dewe,  
Dil-hinavêm, ruhêm ewe,  
Rabe, rabe, mîr Barzanî!  
Li meydanê şêr Barzanî!

Gumana me Kurdistanane,  
Çi derdekî bê dermane?  
Mîna zarê bê dê mane.  
Rabe, rabe, mîr Barzanî!  
Li meydanê şêr Barzanî!

Şûrkêşê te ev çend sale,  
Koroxlî û Rostem-Zale.  
Cegerxwîn jî pir dinale.  
Rabe, rabe, mîr Barzanî!  
Li meydanê şêr Barzanî!

Şêrê kurdan bike gazî,  
Li te nayê belengazî.  
Tu mîrxasî weke bazî.  
Rabe, rabe, mîr Barzanî!  
Li meydanê şêr Barzanî!

Kurd gelleke ser hev nîne,  
Qadir lema dil birîne.  
Çima îro hesp bê zîne?  
Rabe, rabe, mîr Barzanî!  
Li meydanê şêr Barzanî!

s. 1980

## BAHAR WERE, BAHAR WERE

Emrêm, ruhêm, per-basikêm.  
Bahar were, bahar were,  
Çira çavêm, eşqa dilêm,  
Bahar were, bahar were,  
Rê nîşanke kurd bêzare.

Werc şenke van dîyaran,  
Şewqê bide best, beyaran.  
Bila şînbe belgên daran,  
Bahar were, bahar were,  
Rê nîşanke kurd bêzare..

Tu hekîmî, tu loxmanî,  
Dil-hinavî, piştovanî.  
Feqîrara dû-dermanî,  
Bahar were, bahar were,  
Rê nîşanke kurd bêzare.

Gellek dewran derbaz bûne,  
Wek te îtbar dost nebûne.  
Mera bê şer yektî bîne,  
Bahar were, bahar were,  
Rê nîşanke kurd bêzare.

Nêta kurdan zû bê sêrî,  
Kurdêm nebin qûl û cêrî,  
Tu tev Xwedê veke dêrî,  
Bahar were, bahar were,  
Rê nîşanke kurd bêzare.

Welat ya me, em bê warin,  
Hebûn ya me, êm bê parin.  
Neyarêñ me pir xedarin,  
Bahar were, bahar were,  
Rê nîşanke kurd bêzare.

Çar kerîye wenate me,  
Kerîk bûye dewlata me.  
Sê par dîle miletê me,  
Bahar were, bahar were,  
Rê nîşanke kurd bêzare.

Nayêñ jimar şehîdê me,  
Zindan tijî egîtê me,  
Bal beg tune rûmeta me,  
Bahar were, bahar were  
Rê nîşanke kurd bêzare.

Neyar ji me zef dibêjin,  
Çawa zêwir tim dimijin.  
Serbar dibêñ ev çi gêjin.  
Bahar were, bahar were,  
Rê nîşanke kurd bêzare.

Kurdistanam eşqameye,  
Azadarî heqêmeye.  
Ulm û xwendin risqêmeye  
Bahar were, bahar were,  
Rê nîşanke kurd bêzare.

Heyştê heyşa, wê adarê,  
Seddam gelêm da bin jerê.  
Heyf jê hilda şirîtdarê,  
Bahar were, bahar were,  
Rê nîşanke kurd bêzare.

Pêşmergên me serê çiyan,  
Gêrîlên me dora rîyan.  
Wan helalbe şîrê dîyan,  
Bahar were, bahar were,  
Rê nîşanke kurd bêzare.

Agîrê Kewa Newroz anî,  
Ser sînor şemal danî.

Serê Dehq ber gel danî,  
Bahar were, bahar were,  
Rê nîşanke kurd bêzare.

Hêsîr, bindest nebin merî,  
Dîsa vêxin wî agirî.  
Retkin dijmîn, morkin dêrî.  
Bahar were, bahar were,  
Rê nîşanke kurd bêzare.

Dunya mera cî-war bûye,  
Me cahanê can danîye.  
Gel dizane neheq kîye,  
Bahar were, bahar were,  
Rê nîşanke kurd bêzare.

Kurd dikare bi şer bêje,  
Dujminan lez-bez bukuje,  
Em naxwezin xwîn birije.  
Bahar were, bahar were,  
Rê nîşanke kurd bêzare.

Aşîtî me eşkere kir,  
Şer, dew, kuştin bêkare kir.  
Me dêmokratîya pêşta bir,  
Bahar were, bahar were,  
Rê nîşanke kurd bêzare,

Qadir şabe serok heye,  
Ew ji nisila çê, xas bûye.  
Mera dewlet, dîrok daye,  
Bahar were, bahar were,  
Rê nîşanke kurd bêzare.

## ÇİMA GAZİNÎ?

Şerê kal, bava,  
Dibin salava,  
İdrîs, Mexûsdva,  
Çima gazinî?  
Mêrxas Barzanî,  
Mera nav anî.

Kurd tew mîrxasin,  
Tu car natirsin,  
Heyfê bê kesin.  
Çima gazinî?  
Mêrxas Barzanî,  
Mera nav anî.

Kurdêm wek zêrin,  
Qet zeng nagirin.  
Merek sed mîrin.  
Çima gazinî?  
Mêrxas Barzanî,  
Mera nav anî.

Her der gulistan,  
Tew bax û bostan,  
Te da Kurdistan.  
Çima gazinî?  
Mêrxas Barzanî,  
Mera nav anî.

Rabin tev lêxin,  
Dujmin çolaxin,  
Heyfa me derxin,  
Çima gazinî?  
Mêrxas Barzanî,  
Mera nav anî.

Qadir, negirî,  
Rojê buhurî,  
Serîk sed serî,  
Çima gazinî?  
Mêrxas Barzanî,  
Mera nav anî.

## AGRÊ KAWA

Agrê Kawa bibî pîroz,  
Te daye me cejna Newroz.  
Pêparê te gel aza kir,  
Şemala te dunya şakir.

Emrê te wek emrê tavê.  
Tîréja te gul-nûr davê,  
Te hîşyar kir erd û esman,  
Heland qeşa dora çeman.

Mêrg û çîman, bax û bostan,  
Te kir her der gul-gulistan.  
Teberika dewr, qurnayî,  
Mera rê-dirb nîşandayî.

Heyfê îro kurd bê pare,  
Bê dewlete, ustu xare.  
Bin destada zare-zare,  
Beden sere, dil çar pare.

Ahal-cahal, keç-xort, mezin,  
Em tew heqê xwe dixazin.  
Pêşmergê me serê çîyan,  
Gêrîlê me dora rîyan.

Emê destêx bidin destan,  
Welat rakin bêjin dostan.  
Agrê Kawa dîsa vêxin,  
Dor wî agrî cengê lêxin.

-Bijî Newroz, bijî Kawa,  
Gel aza kir ji şer-dewa.  
Bona agrê Kawa pirbe,  
Xwînam tev kin alav gurbe.

Ev şemala dicebrîne,  
Mera çê bûn, yekbûn tîne.  
Ser sînora agir vêxin,  
Hêdî-hêdî berjêr daxin.

Har Dehakan ji text bixin,  
Wan xwînxara nav me derxin.  
Kurd jî mîna gelê dunê,  
Aza bijîn li vê dunê.

Bijî Kawa, bijî gelok,  
Jî bîr naçe dewr û dîrok.  
Serok heye, Qadir şabe,  
Bê serketin dewlet nabe.

s.1986

## TU KES ŞERA NEBÎNE

Şerê neheq û bê xêr,  
Dû-dermanê jer bê kêr.  
Zor atomâ xezebî,  
Neçin bendaça zevî.

Nebe tu sal, zemana,  
Şerê steyrkê esmana.  
Şîn-şepûka şer tîne,  
Tu kes şera nebîne.

Rojé xela, şin-girîn,  
Dil kiribûn kul-birîn.  
Zarêñ tezî û bê bay,  
Xwîna wana bibûn av.

Zare-zara biçûkan,  
Şev-ro, şîna dayîkan,  
Şîn-şepûka şer tîne,  
Tu kes şera nebîne.

Xofa şêr pîr girane,  
Gelran bela zor tîne,  
Şer û dewê bê mecal,  
Kêmkin, redkin sal bi sal.

Eve nêta bendê xêr,  
Kes nebîze dengê şêr.  
Şîn-şepûka şer tîne,  
Tu kes şera nebîne.

## YA LÎ ME BÛ KESÎ NEBÛ

Hezar nehsid heştê heşta filê daşnak menîk çekir,  
Dewa erdê Qerebaxê bi neheqî li ecem kir.  
Şerê berê dîsa rakir, kurd-azerî dero-der kir.  
Ew çi qirar, çi ferman bû, ya li me bû kesî nebû.

Şerekî zor me qewimî vê payîzê, wê berekê,  
Li rex gûndê Erezdegîn ser sînorê Sederekê,  
Ewledê xwe dê davêjin ber vî şerî, teqe-reqê,  
Ew çi qirar, çi ferman bû, ya li me bû kesî nebû.

Dora malê me çend kurdan fila girtin sûr-çepere,  
Gulla davên hezaranva, kurd hindike pê nikare.  
Gûman tune jin, zar bikişe, ber bi posta ûris here,  
Ew çi qirar, çi ferman bû, ya li me bû kesî nebû.

Filê daşnak şerê berê qet bîr nake çar lê nabe,  
Şev-ro dikşê ser malê me, bê jimare, bê hesabe.  
Hukumeta ûris çîma pêşta nayê qêt tey nabe?  
Ew çi qirar, çi ferman bû, ya li me bû kesî nebû.

Meyra Barî kire gazî, got zû deren ji malane.  
Şerê iro zef girane, roja xalçê, bavçeyane.  
Tîtal, Kinyaz, Wekîl rabin, guman bawer li we mane...  
Ew çi qirar, çi ferman bû, ya li me bû kesî nebû.

Tîtal, Kinyaz, Wekîl rabûn, tifing hildan, keç-bûk pêra,  
Gulla çapê ser dijminda pirr barandin hevra-hevra.  
Rêk vekirin hêsîr kişi tele-tele wan navara...  
Ew çi qirar, çi ferman bû, ya li me bû kesî nebû.

Barîyê Hecî kalemêre, mal razaye haj pê nîne,  
Har dijmina dor birîne, gullan rast-çep direşîne  
Tîtal, Kinyaz li meydanê xwîna sorda xemilîne...  
Ew çi qirar, çi ferman bû, ya li me bû kesî nebû.

Barîyê Hecî birindar bû, keç tifala Zînê serda,  
Xêrxwazekî xêrê tune, bersîv bide êla kurda.  
Gazî dikim hewar nayê, çi girane, eva derda...  
Ew çi qirar, çi ferman bû, ya li me bû kesî nebû.

Kerem lez-bez mîna şêran maşîn ajot çû meydanê,  
Ji meydana şêr birîndar revand bire ber dîwanê.  
Malê kurdan talan kirin, lodê gîhê agir danê.  
Ew çi qirar, çi ferman bû, ya li me bû kesî nebû.

Lorkê bûka milan revîn ketin çola best, beyaran,  
Cabê bidin hemû dera, her dewletan, her dîyaran.  
Pêşikêşê kurdan kanî, sitar bike mal-cî-waran...  
Ew çi qirar, çi ferman bû, ya li me bû kesî nebû.

Mala davêne reve, beze, bese yek-yek em zêrandin,  
Tu kes mera nabin xwîn-goş, cî-warê xwe tu car nadin.  
Tev hilgerîn, tev dagerîn, Kurdistanê dest bernedin...  
Ew çi qirar, çi ferman bû, ya li me bû kesî nebû.

Heyfam nayê li wê heyfê, kurd tew bê mal, bê hal maye.  
Heyfam tenê li wê heyfê bê tifaqî me dest daye,  
Dil nêzîke dest nagêjê, bextê kurdan çîma haye?  
Ew çi qirar, çi ferman bû, ya li me bû kesî nebû.

Qadir Motî me kurdanra, Xwedê çîma bextek neda.  
Wek qulingê xerîb em jî bigihiştana refê xweda.  
Refêm, zulme xerebîye, xalifîme herme kuda,  
Ew çi qirar, çi ferman bû, ya li me bû kesî nebû.

s.1988

## QEREBAKÊ

Fila zeft kir cî-warê me,  
Hêsîr birin bûk-zerîyê me.  
Bomba davên ber derîyê me,  
Xwîn dirije Qerebaxê.

Laçin, Şûşe mera bû dax,  
Xocalîyê hindik man sax.  
Wêran kirin bostan û bax.  
Xwîn dirije Qerebaxê.

Top, tifinga guje-guje,  
Ewledê xwe dê davêje...  
Xortê mîrxas zû dighîje...  
Xwîn dirije Qerebaxê.

Lezgî, taliş, kurd birane,  
Azerî-em lêv-dirane,  
Namûs, tesîb çi girane-  
Xwîn dirije Qerebaxê.

Kurêm, şûrê Babek bîne,  
Ne em nisla şêr Nebîne.  
Hevra lêxin dereng nîne...  
Xwîn dirije Qerebaxê.

Senger çêkin li ser milan,  
Li ser rîyan danin telan,  
Ji mala me derxim filan.  
Xwîn dirije Qerebaxê.

Qadir Motî dibê çend car,  
Xeza bikin daşnakê har,  
Fitê nedin bivin cî-war...  
Xwîn dirije Qerebaxê.

1992

## LAÇİNÊ

Erdê şêran, cî-miskenê kal-bavan,  
Li van waran mal danîne Laçinê.  
Gulistane, çar alî çem, kanîne,  
Vê cinetê sał danîne Laçinê.

Vî welatî bendê qewat xas jîne,  
Sultan begê mîrxas, Nebî pirr bûne,  
Zeman derbaz bûne, qurne-dewr çûne,  
Lehangê ha pal danîne Laçinê.

Hukumdarên zor, qetikkar pirr hatin,  
Ew hincirîn ber çavê xwê gor dîtin.  
Dew-dozada nav-namûs tew avîtin,  
Belgirê wan nel danîne Laçinê.

Daşnakê har qelp, xayîn, dil xilte,  
Mîlyon salî ew cîranbe rast rex te.  
Ew nemerde, bê îtbare, bê bexte,  
Wana hezar fêl danîne Laçinê.

Dijmin dirre, seyê harî dev germe,  
Ew şerm nake iro dîsa tê ser me.  
Ji piştâ wan dêrxin du-sê zol çerme,  
Bila bêjin xal danîne Laçinê.

Deşt-zozanê te bedewin, delalin,  
Şer-dewada keç-xortên te wck Zalin,  
Me nikarin, neyar ji dil dinalin,  
Dujmin hezar dîl danîne Laçinê.

Sultan beg, tu zû sîyarbe hespê bê,  
Xortê êlê tew rabûne tesîbê.  
Dijmin qirkin şev, berbangê her sibê,  
Mêrxasê çê gel danîne Laçinê.

Qadir Motî merd - nemerda nas dike,  
Mêrxasê çê esil-nesla xas dike,  
Bendê nemerd fêlê kotî hiz dike,  
Ser fêlpîsa pel danîne Laçinê.

## NEDNE DİJMİN KELBECERÊ

Hewar!... hewar!... Gazî, hewar!...  
Filla zeft kir, xan-man, diyar,  
Hêsîr birin kal, pîr, jîn, zar,  
Nedne dijmin Kelbecerê!

Hewar!... hewar!... Rabin, hewar!...  
Xwînê hilda best û beyar.  
Li her derê şîn zare-zar,  
Nedne dijmin Kelbecerê!

Hewar!... hewar!... warêñ hewar!...  
Kulfet maye rût bê sitar,  
Kanî pêşvan, kanî serkar?  
Nedne dijmin Kelbecerê!

Hewar!... hewar!... Dîsa hewar!...  
Daşnakê dir wek seyê har,  
Xwîna gelêm ceng-ceng vexwar,  
Nedne dijmin Kelbecerê!

Mil girêdan xort birin dîl,  
Keç-bûk kirin rusa, rezîl,  
Maldîroka Kekê Şemîl,  
Nedne dijmin Kelbecerê!

Şûşa, Laçin, him Xocallî,  
Warê meyî millyon salî,  
Xeznê birin dilêm nalî,  
Nedne dijmin Kelbecerê!

Heyfa beroj, belekiya,  
Daristana, çem-kanîya,  
Rêzê konna li ber çîya,  
Nedne dijmin Kelbecerê!

Ew bizdokê wek rûvîya,  
Derxin, dûrxin bê nan-xoya,  
Rakin xal çê û bav çêya,  
Nedne dijmin Kelbecerê!

Şîna êlê, hêsrên dîya,  
Heland kevir, tepîkir çîya.  
Boy xatirê ruhê çîya.  
Nedne dijmin Kelbecerê!

Ewe eşqam, qudra min,  
Nav-namûsam, rûmeta min,  
Temil nake xîreta min,  
Nedne dijmin Kelbecerê!

Rabin lêxin, îdî bese,  
Bila nebêñ kurd bê kese.  
Welatê me hildin ese,  
Nedne dijmin Kelbecerê!

Qadir Motî bike gazî,  
Karê nade belengazî,  
Qırkin, redkin, wî fêlbazî,  
Nedne dijmin Kelbecerê!

## MÊRXASÊ KURDAN

Dewr û bilada,  
Şerê flîada,  
Nedane derda,  
Mêrxasê kurdan.

Kê Laçin par da,  
Wan êl da derda.  
Hûn rabin berda,  
Şêr xasê kurdan.

Îsmayîl lêxe,  
Evdo çolêxe,  
Misto erdêxe-  
Şêr xasê kurdan.

Qerebax rinde,  
Bajar û gunde,  
Lê digere kunde,  
Şêr xasê kurdan.

Bendê har, xedar,  
Xocalî...jin, zar  
Kirin tegezar,  
Her xasê kurdan.

Goranboy ra bû,  
Êl, obe şâ bû.  
Lê Şûşe çâ bû?  
Xêr xasê kurdan.

Bese her heder,  
Gav bavên ber-ber.  
Wana daye der,  
Ber xasê kurdan.

Sayîrê kurdan,  
Dest van kul, derdan,  
Cî-warêx berdan,  
Wer xasê kurdan.

Ew çem û kanî,  
Xêr-bêr û xanî,  
Egrîce kanî?  
Mal xasê kurdan.

Şemoyê axa,  
Şewata saxa,  
Dax da ser daxa,  
Hal xasê kurdan.

Heyfa wan deran,  
Best û beyaran.  
Nedin neyaran,  
Xal xasê kurdan.

Li vî hinberî,  
Kurd û azerî,  
Dilek du merî,  
Bal xasê kurdan.

Tankê weye hur,  
Kirinê gure-gur,  
Dujmin qirkin pirr,  
Gel xasê kurdan.

We kurê şêran,  
Mêrxasê mîran,  
Bîr nake dewran,  
Êl xasê kurdan.

Esil-nisla xas,  
Tim daye mîrxa.  
Lêdin bi hewas,  
Kal xasê kurdan.

Qadir bi guman,  
Dibê sal-zeman,  
Rabe Kurdistan,  
Dil xasê kurdan.

Îsmayîl lêxe,  
Evdo, çolêxe,  
Misto, erdêxe,  
Xal xasê kurdan.

## LOXMANÊ MEZİN

Rewayî bijîk-doxtrê navdeng  
Baxîşê Huseyn dikim.

Boy Qerebaxê,  
Dikşînim axê,  
Qencke vê daxê,  
Loxmanê mezin.

Dijmin digrije,  
Bomba davêje,  
Zara dikuje,  
Loxmanê mezin.

Neyarêñ dîn-har,  
Zeft kir best, bêyar,  
Gel mayc bê war.  
Loxmanê mezin.

Mekanê kurda,  
Kana kul, derda,  
Laçin kê par da,  
Loxmanê mezin.

Kelbecer kirre,  
Kanî lê pirre,  
Avgermik durre,  
Loxmanê mezin.

Bona Kûbadlî,  
Ji dil dinâlî,  
Ruhva li balî,  
Loxmanê mezin.

Jin, zar, kal, pîran,  
Derxin dest guran,  
Weynin hêşîran.  
Loxmanê mezin.

Can Azerbaycan,  
Te da çê însan,  
Tebîbê derdan,  
Loxmanê mezin.

Destê te nûre,  
Kêra te şûre.  
Derd davê dûre,  
Loxmanê mezin.

Bi zora millan,  
Derdixî gullan,  
Qenc dikî dilan,  
Loxmanê mezin.

Kanî Zengîlan,  
Mekanê gulân.  
Dermanê dilan  
Loxmanê mezin.

Nexwaşê giran,  
Qenc dikî heyran.  
Bîr nake dewran,  
Loxmanê mezin.

Sayîrê kurdan,  
Hez dike merdan.  
Nebînî derdan,  
Loxmanê mezin.

Baxış xêr hatî,  
Te şakir Motî.  
Şukur tu xortî,  
Loxmanê mezin.

## EREZO, RÊ BİDE

Ez vî alî, yar wî alî, Erezo, rê bide,  
Mal vî alî, war wî alî, mirazo, rê bide.  
Esmera min virda nayê, Erezo, rê bide,  
Hesreta wê dil dernayê, mirazo, rê bide.

Gundê yaram ber palêye, Erezo, rê bide,  
Li çar para ew belaye, mirazo, rê bide.  
Mala yaram ya jorêye, Erezo, rê bide,  
Derê malê şemal daye, mirazo, rê bide.

Tîrêja wê ez helandim, Erezo, rê bide.  
Ez jar kirim, kûr telandim, mirazo, rê bide.  
Ser gundê wê mij dûmane, Erezo, rê bide,  
Dûman naçe bê gumane, mirazo, rê bide.


Ez aşiqê bezna delal Erezo, rê bide,  
Kenê şekir, dengê zelal, mirazo, rê bide.  
Kevotka min kê girtîye, Erezo, rê bide,  
Zûva min ew neditîye, mirazo, rê bide.

Bextê yarê çîma haye, Erezo, rê bide,  
Tîrs-xofa wê dilêm daye, mirazo, rê bide.  
Hêsrê çavê ewê yarê, Erezo, rê bide,  
Dil-hinavêm anî xarê, mirazo, rê bide.

Gundê yarê def-dewate, Erezo, rê bide,  
Yar nalîze bi minete, mirazo, rê bide.  
Ev ci zulme min dest daye, Erezo, rê bide,  
Nêt-meremêm li bal wêye, mirazo, rê bide.

Xwuzla carkê yarbihata, Erezo, rê bide,  
Gilî-gazin min bigota, mirazo, rê bide.  
Rê, dirb tune yar bê, here, Erezo, rê bide,  
Seva delêv herro şere, mirazo rê bide.

Yaram kurde-ew helale, Erezo, rê bide,  
Mîna ava te zelale, mirazo, rê bide.  
Şolû dikin hezar sale, Erezo, rê bide,  
Qadir lema bi mitale, mirazo, rê bide.



# MENAL, DILO

## DUNYAYÊ

Ax dunyayê, bê wefayê, tu kesîra milk nemayê,  
Hinekara def-dewate, hinekara şer dunyayê.  
Ruhberê lê tew mîvane, nav bi navan nemet dayê,  
Hinekara şekir, şerbet, hinekara jer dunyayê.

Hinekara gulistane, hinekara zivistane,  
Hinekara bax-bostane, hinekara goristane,  
Hinekara mal-hal daye, hinek bê kes li bestane,  
Hinekara nûr-cinete, hinekara gor dunyayê.

Hîmê dunê kê danîye, ew miqîme, qet xar nake,  
Tenê mîna nanê sêlê, werdigere wîra pake,  
Hezar salî kê xayîke, roja axê wî ranake.  
Hinekara şemal dayê, hinek jî hişt kor dunyayê.

Felek, dewran, qurne, zeman, destûra wan dunê daye,  
Ruhistîn jî bê wext dibe, wîra çawa qayde haye,  
Herek xwera dikişîne, dunê ber wan zelûl maye,  
Gellek meriv pişt kirîye, hinekara bar dunyayê.

Sêra dunê zef girane, çîya, banî, bera kûre,  
Hinekara tete, raste, hinekara dive sûre.  
Hinekara risq dayêda, hinek ji risq gellek dûrc,  
Hinekara tem lezetê, hinekara şor dunyayê.

Qadir Motî, dunê dore, yekî nû tê yek lê dere,  
Rokê şirîn, rokê tele, rokê germe, rokê sare,  
Axa-xulam tev wêda kir, tenê sebra wî sitare,  
Hinekara xêr-xezneye, hinekara jar dunyayê.

## Lİ VÊ DİNÊ

(Ji gel)

Bendek jîye, pirr kal bûye,  
Jin mirîye, bedhal bûye.  
Bûk yeman bê fesal bûye,  
Bêkar jîne li ve dinê.

Bûk ji kalê qe hez nakek,  
Hertîm ji wî xeyba dike.  
Nebendîya, sûca dike,  
Bê kal bijîn li vê dinê.

Gilî-gazin bêjim kêra,  
Her ro minra dide çêra.  
Ez qul-hêsîr nabim wîra,  
Cêrî bijîm li vê dinê.

Kalê dîne, hîm bi kîne,  
Ber vê zulmê kes namîne.  
Ezê herim tu bîmîne,  
Hûn tev bijîn li vê dinê.

Mêro, neyê deng-hesê me,  
Kes nebîze hes-besê me,  
Şermî nebîn bal nasê me,  
Tenê bijîn li vê dinê.

Kalê çawa derxin wêda,  
Bûk mérê xwe tîne rêda.  
Mital dikin bibin kuda,  
Bê kal bijîn li vê dinê.

Bavo bibe gulistanê,  
Ji wir herin daristanê.  
Wir pake ji goristanê,  
Rehet bijîn li vê dinê.

Tu sebetê here bîne,  
Bavê xwe jî bixapîne.  
Bibe cîkî xewle dayne,  
Aza bijîn li vê dinê.

Mîna mara ziman derxist,  
Mêr razîkir, çira vêxist.  
Lez-bez kalê ji mal dûrxist,  
Serbest bijîn li vê dinê.

Bavê dibe dûr datîne,  
Ew vegare, bav bimîne.  
Bav dibêje ev çi kîne?  
Lawo, bijî li vê dinê.

Kuro, sebet cî bi cî xêre,  
Ewê bibe, tera kare,  
Wext bê, bona tê cî-ware,  
Hûne bijîn li vê dinê.

Li vê dinê deyîn namîne,  
Deynê zemîn, dewr distîne,  
Kurê te jî, wê te bîne,  
Bê deyîn bijîn li vê dinê.

Kur vê demê serwaxt dibe,  
Li ber bavê duqat dibe.  
Bavê tîne, rehet dibe,  
Bavo bijî li vê dinê.

Kur bavê xwe paşa tîne,  
Zef bi hurmet mal datîne.  
Ew dibîne jîn bi kîne,  
Dibê nejî li vê dinê.

Bûkê dît, ku kalê sax hat,  
Revî, şas bû, ew erdê ket.  
Pînge-pînge kir, ji mal derket,  
Diçim, bijîn li vê dinê.

Bûkê xweser, bê esîl-zat,  
Bal wan tune-tore-terbet,  
Wanda nabe ebûr, rûmet  
Ew rûreşin li vê dinê.

Ewan berxên ber bizinan,  
Mişkên çolê, terazinan.  
Mêrên tim bin tînên jînan,  
Qet nemînin li vê dinê.

Bila bêjîn bê dundane,  
Tenê nebêñ ev kal kîne?  
Ew kesêñ ku, bê bav jîne,  
Xweser jîne li vê dinê.

Bûkêñ şîrê heram mêtî,  
Esil nisla xerab ketî.  
Nelê bîne Qadir Motî,  
Bila nejîn li vê dinê.

7.II. 2007  
Bakû

## DİLÊM

Cahalya min teyrê baz bû, bask vedida li esmanan,  
Difirîyam serbest, aza wextê bîst yek salî, dilêm.  
Mîna bilbil min distira, ken, henekêm herro hebûn,  
Dewrana min kana eşqê, ji vê kanê kelî dilêm.

Hespê miraz ez revandim best-beyaran ez gerandim,  
Ez şâ kirim, gellek neçû, çerx-felekê ez telandim,  
Derd û kula li min ser da, ser min birî ez helandim,  
Rozgara min minra nehat, şikest ji kûr nalî dilêm.

Kasibayî, kalbûn, pirbûn, zarêñ bê dê tew girane,  
Jina bê zar, keça bê mîr, bendê kela, bê mikane,  
Mirina bê miraz, ter can, zef derdekî bê dermane,  
Ji van derdan minra par ket, hêdî-hêdî helî dilêm.

Ji qelema Feqîyê Teyran, Ehmed Xanî gul-nûr þarî,  
Sulheddînva Rostemê-Zal nav hiştine bi dilbarî,  
Silêymînra dunya nema, axa wan bû erdê tarî,  
Çûne, kanî mîrê dila, tenê ma dor xalî dilêm.

Dostê nemerd, qewmê bê fem, kes nebîne tu dîroka,  
Çavnebarî, fend-fêlê wan dame şermê bal şirîka,  
Dane mînda derd û bela, ez xistime şîn, şîpûka,  
Ten û niçê bê namûsan li min kar kir, kalî dilêm.

Qadir Motî, xema meke, xem xarabe, mebe bêzar,  
Ha namîne, sebirax bîne, dunê yeke, derge hezar,  
Xulam bibe axa-pake, axa xulam bû zare-zar,  
Tebîyetê ez xapandim, naha here kalî dilêm?

## HÎŞT FELEKÊ

Gellek qurne dewran çûne çerx felekê kes nasnake,  
Sêra dila wê vene kir, dilda sêr sar hîşt felekê,  
Alîkîva mal, hal didê, alyê dinva jê distîne,  
Tu kes heta sêrî nebir, nivcî, bê kar hîşt felekê.

Malê dinê zef şirîne, her kes xwera dicivîne,  
Dixapîne, jê distîne, roja axê dişivîne,  
Tenê ïzna kefen didê, navê pak, pîs pey dijmîne,  
Gellek mîrxas belengaz kir, tenê, din-har hîşt felekê.

Ew natirse, fedî nake, tu kesîra gilî navê,  
Kanê axa, kanê padşa, hukumdaran ji text davê,  
Dê ji keçê, kur ji bavê, mîr ji jinê wê da revê,  
Rostemê Zal Hatem avît, xezav, xedar, hîşt felekê.

Tel ji şirîn, xêr ji guna, şîn ji şaya cuda nekir,  
Mervê nemerd, xayîn, xwînxar pak tîmarkir, por lê şekir,  
Malê ava, bax û baxçe, ode, xan-man, wê belakir,  
Xortê cîwan bê miraz bir, bê dost, bê yar hîşt felekê.

Adem, Firon wê nasnake, kî nás dikê, pê nikare,  
Mêr-mêrxasan, pelewanan hesab nake, gurê hare,  
Kanî welat, kanê dewlet, Qadir Motî bê sitare,  
Kurdistana rengin kanê, bê mal, bê war, hîşt felekê.

s1988

## HAT-ÇÛ

Vê dunyayê emrêm lez-bez,  
Çawa tavîk, baran hat-çû.  
Dunya bû rê, ez bûm rêu,  
Min qet nekir, dewran hat-çû.

Bazirgan bi gazî, hewar,  
Difrot qumaş, lel, karîbar.  
Min xast hildim bibim tucar,  
Heta rabûm, kewran hat-çû.

Revîm berbî çav belekê,  
Bidme wêda sor gulekê.  
Rîyam birrî çerx felekê,  
Negêştimê, heyran hat-çû.

Dewran xerab, yar bê îtbar,  
Ez kal kirim bextê bê kar,  
Da min merez, kul zare-zar,  
Yekî dinva, seyran hat-çû.

Min bax reşand, bar hilneda,  
Şev-ro bar bir, kar hilneda.  
Kevir hilda, ar hilneda,  
Lema halêm giran hat-çû.

Kurdistan ber her pîsîya,  
Şer kir tab kir, netirsîya,  
Heta mirêm pê hesîya,  
Ehmed Xanî, Teyran hat-çû.

Qadir, dunya kana derda,  
Kêra cefa, kêra nûr da,  
Me kurdanra ax-of, pir da,  
Hesret dilda, Goran hat-çû.

## KAL BÛM

Min nizanbû çawa zû hat,  
Ser min birî bê par kal bûm.  
Dest diheje, çav nabîne,  
Ling nagere, pişt xar kal bûm.

Ev dewrana çîma haye,  
Dixapîne qewl nemaye,  
Felek korbe hukum daye,  
Ne ku carkê, sed car kal bûm.

Xeybê qewma, vizê jina,  
Mîna kêra wek dujmina,  
Dil kerî kir, bûme fina,  
Derdê birê dilsar kal bûm.

Dewran pis hat çû cahalî,  
Qismet nebû xwaş bermalî,  
Nolî mara li min alî,  
Nav li ser min, bê yar kal bûm.

Derdêm zefe derda dere,  
Kalbûn berfe, him bagere,  
Jina malê sewdesere,  
Bal kur tune bawer, kal bûm.

Heta heme li vî erdî,  
Ji mirinê nakim fedî,  
Yek mîranî, yek jî merdî,  
Minra maye sed par, kal bûm.

Qadir, dunê çîma haye?  
Tu kesîra milk nemaye,  
Çi ku min dît zor, cefaye,  
Pêncî salî dîn-har, kal bûm.

1988

## MİNRA NAYÊ

Çerxa felek çerx vege rand,  
Dewrana min minra nayê.  
Heval-hogir dûr direvin,  
Kewrana min minra nayê.

Êla kurdan bû derbeder,  
Bê dewlete, maye bê ser.  
Heland min da nema ceger,  
Gumana min minra nayê.

Mala rengîn bi dost, mîvan,  
Kete destê bendê sewsan,  
Cî-warê nû, derdê giran,  
Dermana min minra nayê.

Dost û yaram bê dil, bê can,  
Serê zimîn dibên qurban,  
Roja eşqê sîng, ber meydan,  
Seyrana min mînra nayê.

Bext ku çû bal mervê nezan,  
Rûvîbe jî dike eslan,  
Der-dor girtin wan neyaran,  
Eslana min minra nayê.

Qadir Motî, xema meke,  
Deryê xêrê Xwedê veke.  
Emirê rojê reş hindike,  
Emana min minra nayê.

1999

## BEXTÊM

Ax felekê, zulimkarê,  
Çawa te kir bê kar bextêm.  
Zemîn çerxam çep vegerand,  
Nehîst bide zer-bar bextêm.

Çend car reşand baxçê gulan,  
Ez nebînim derd û kulan,  
Zêde kirin derdê dilan,  
Dil firote tucar bextêm.

Ez şâ nebûm bextê berîn,  
Li halê min gişk digirîn,  
Çiqas merez, kul û birîn,  
— Jê hildaye ducar bextêm.

Herin bêjin neyaranra,  
Bila şâ bin xwera-xwera,  
Zarêm hûrin, kalbûm pêra,  
Sed şîn danî ser xar bextêm.

Daykan zû mir kûr nalîyam,  
Jin bê miraz çû kalîyam,  
Zar bê dê man ez helîyam,  
Zarê minra bû par bextêm.

Dijminê min tim zerêda,  
Dilêm dide ber tîrêda  
Çem û kanî av berêda,  
Tim vedixwe jer-mar bextêm.

Felek dewran gurê hare,  
Mêrê mîrxas pê nikare,  
Bona merda parsîxare,  
Xiste hepsê dînhar bextêm.

Qadir Motî pêncî salî,  
Xweş roj nedît ji dil nalî,  
Bê guman ma kezey helî,  
Xwîn vedreşc xwînxar bextêm.

1986

## AX, FELEKÊ TU BELABÎ

Ax, felekê, zulimkarê,  
Te kafira bê îtbarê,  
Dil sot li min anî xarê,  
Ax, felekê, tu belabî.

Ya ku te kir, kesî nekir,  
Dê ji zara, mal belakir,  
Kezey ser dil, herd tev jêkir  
Ax, felekê, tu belabî.

Felek, zûva sewdeserî,  
Sêfilara kul û jerî,  
Bê dil-hinav, bê cegerî,  
Ax, felekê, tu belabî.

Te wêran kir mal û halêm,  
Bê baxçevan hîştin gulêm,  
Ha zêde kir derdê dilêm,  
Ax, felekê, tu belabî.

Min gul reşand bi hesretî,  
Av lê birîn, gul mane tî,  
Bila xweş bin qewm xal, xatî,  
Ax, felekê, tu belabî.

Hat buhurî sal û zeman,  
Qadir te da nedît guman,  
Te welgere text û dewran,  
Ax, felekê, tu belabî.

## HEWAR-HAYÊ

Rewayî dayka heşt ewledên xwe-  
Tamara İsmayîl dikim

Felekê, te çima ha kir?  
Dê ji zaran, mal bela kir,  
Dost girîya, dujmin şâ kir,  
Ax felekê, hewar-hayê,  
Te kir, dewran minra nayê.

Gelî qewma, der-cînara,  
Bermalîya min şêr bû minra,  
Birîndar kir bi heşt kêra,  
Ax felekê, hewar-hayê,  
Te kir dewran minra nayê.

Delala min bisk badaye,  
Li bal daykam kon lêdaye,  
Kon bê kulîn, bê çit maye,  
Ax felekê, hewar-hayê,  
Te kir dewran minra nayê.

Çêlek doşê, bêrîvanê,  
Kon lêmede li aranê,  
Bê te naçim wê zozanê,  
Ax felekê, hewar-hayê,  
Te kir dewran minra nayê.

Ka bedewam, ka delalam,  
Keça kurda, ew helalam?  
Xeyîdiye nayê malam,  
Ax felekê, hewar-hayê,  
Te kir dewran minra nayê.

Xêr nedîta bê mirazê,  
Nedît şaya kur û qîzê,  
Ka Xalîde, digrî Nazê,  
Ax felekê, hewar-hayê,  
Te kir dewran minra nayê.

Dilêş bûme dax jî pêra,  
Hêsrêm diçin xwera-xwera,  
Gilî, gazin bêjim kêra?  
Ax felekê, hewar-hayê,  
Te kir dewran minra nayê.

Mala rengîn pêda-pêda,  
Xêr û xezna di odêda,  
Zarê hûrik te da kêda?  
Ax felekê, hewar-hayê,  
Te kir dewran minra nayê.

Ezê, tera wêne çêkim,  
Ji keviran kinca lêkim,  
Herro bêmê zîyaret kim,  
Qadir dike, hewar-hayê,  
Te kir dewran minra nayê.

1986

## SÊWÎTAYÎ

Gelî qewma, der-cîrana, derdêm zefe çar lê nabe,  
Daye navê bê îlace, şîn, girîne sêwîtayî.  
Ew çivîkê bê per-baskin, pîl keştine fir pê nabe,  
Dixišikin, dilitimin, dil birîne sêwîtayî.

Dê bû çivîk firî dûr çû, cûckê wê collê maye,  
Dengêm naçê, dest nagejê, venagere, bextêm haye.  
Felek korbe, ev ci zulme, ci belaye min dest daye,  
Îske-îskin, zare-zarin, kul birîne sêwîtayî.

Kûvî, xezal, karê xweva tev diçérin, kale-kalin,  
Karê sêwî bîna xweva dê digerîn, nale-nalin,  
Zarê bê dê belangazin, ew bê gune, bi zewalin,  
Monik-monik ez helîyam ci girane sêwîtayî?

Zarê sêwî, warê nûhda ten û niçê bendê kotî,  
Rojê giran, tew revîyan hezar carî can-can gotî,  
Ber van derdan, ji te pêştir, kes tab nake, Qadir Motî,  
Şikesteke, nacebire, bê dermane sêwîtayî.

1986

## BELENGAZÎ

Zulma tarî, roja reşî,  
Bîra kûrî, belangazî,  
Mîna mara lê dialî,  
Jan û jerî, belengazî.

Bê rê, bê dirb, cîkî kûrrî,  
Gurê harî, seyê dirrî,  
Li bal kêbî Xwedê birrî,  
Gûza korî, belengazî.

Kêra dostî belengaze,  
Ew şanabe, bê miraze,  
Ber bi min tê teze-teze,  
Xwîn-xedarî, belengazî.

Mîna berfê her tim sarî,  
Ne orxanî, ne sitarî.  
Rojê ronik dikî tarî,  
Zulimkarî, belengazî.

Malê ava wêran dikî,  
Sêfilan tu qet şâ nakî,  
Bendê ketî zû ranakî,  
Bê tivdarî, belengazî.

Dixebitim şev-ro, her car,  
Dibî, minra namîne kar,  
Dewletam bir hê sala par,  
Tu bê karî, belengazî.

Belengazî, ne tu çekî,  
Serê bilind berjêr dikî,  
Dijmin, neyar lê şâ dikî,  
Axa sarî, belengazî.

Çima berbi Qadir hatî,  
Dilda qelpî, bê firsetî,  
Tu ne nasî, ne jî dostî,  
Tu neyarî, belangazî.

1988

## MERVÊ NEMERD

Mervê nemerd zûva hene,  
Jî nemerdan nemerd bûne.  
Heta îro tirb kol bûne,  
Nemerd fêlbaz, sêrbaz dîbe,  
Bive pire derbaz nebe.

Derbaz bûn, çûn qurnê, dewran,  
Ser koka xwe maye hewşan.  
Nemérd tu wext nebû guman.  
Nemerd fêlbaz, sêrbaz dibe.  
Bive pire derbaz nebe.

Fendê wana, fêllê wana,  
Serwaxt nabî tu dewrana.  
Sed car bidî sed qurbana,  
Nemerd fêlbaz, sêrbaz dibe.  
Bive pire derbaz nebc.

Sonda dixwun, xwe dikujin,  
Dixapînin, vira bêjin.  
Nizam şeytan, yanê gêjin?  
Nemerd fêlbaz, sêrbaz dibe.  
Bive pire derbaz nebe.

Şera timê nemerd tîne,  
Pey şerara xwe dikşîne.  
Tesîv, namûs bal wî tune,  
Nemerd fêlbaz, sêrbaz dibe.  
Bive pire derbaz nebe.

Ser berjêrin, bî mirûzin.  
Mîna rûvî delikbazin.  
Dilê wana berf û bûzin.  
Nemerd fêlbaz, sêrbaz dibe.  
Bive pire derbaz nebe.

Qadir, tev merd jerê vexwe,  
Mala nemerd hingiv nexwe.  
Ne camarê, wê te bixe.  
Nemerd fêlbaz, sêrbaz dibe.  
Bive pire derbaz nebe.

## DAYKA DELAL

Gellek şevan ranezayî,  
Ber pêçekê ser pê mayî,  
Heta sibê lor-lor dayî,  
Deyîndarim, dayka delal,  
Te daye min şîrê helal.

Nifirê dîya ser kê maye,  
Ew têr naxwe, emir haye,  
Ewê gellek cefa daye,  
Deyîndarim, dayka delal,  
Te daye min şîrê helal.

Gelî xûşka, gelî bira,  
Gilîyê giran nebên dêra,  
Ew hurmetê yê bê wera,  
Deyndarim, dayka delal,  
Te daye min şîrê helal.

Çiqas tiştê bi tem hene,  
Mîna dîya şirîn nîne,  
Kê qencî kir ew dimîne,  
Deyîndarim, dayka delal,  
Te daye min şîrê helal.

Daykê, her wext te dibhîzin,  
Tu şâ bûnê em dilîzin,  
Çavêm derxî nakim gazin,  
Deyîndarim, dayka delal,  
Te daye min şîrê helal.

Qedrê daykan pir girane,  
Ewledara dil û cane,  
Bê fem ewe kî nizane  
Deyîndarim, dayka delal,  
Te daye min şîrê helal,

Ez gazinim ji tebîyetê,  
Wê nefir kir, her çi gotê,  
Dengê dîyam ji bal wê tê,  
Deyîndarim, dayka delal,  
Te daye min şîrê helal.

Xuzla niha daykam bima,  
Felek korbe, zû bir çîma?  
Nehîst gellek xulam bûma,  
Deyîndarim, dayka delal,  
Te daye min şîrê helal.

Qadir Motî bi mitale,  
Bê dê maye kûr dinale,  
Dinya bê dê tim betale,  
Deyîndarim, dayka delal,  
Te daye min şîrê helal.

## WERÊ BİBE BERMALÎYA MİN

Bextê minî betal, bê kar,  
Da min derd, kul, şîn, zare-zar,  
Zar sêwî kir, hişt ustî xar,  
Bê gumanim, delala min,  
Werê bibe bermalîya min.

Zulma min dît hat serê te,  
Mirye jinam, him mîrê te,  
Felek bê qlip, mixenete,  
Bê gumanim, delala min,  
Werê bibe bermalîya min.

Rehma Xwedê li çûyabe,  
Kê dixwast ku rozgar habe,  
Zarêm hûrin bê dê nabe,  
Bê gumanim, delala min,  
Werê bibe bermalîya min.

Tirba wana bive gul-nûr,  
Bê dê mane heşt zarê hûr,  
Em mezinkin wan bê qisûr,  
Bê gumanim, delala min,  
Werê bibe bermalîya min.

Şîrîk, neyar bi gazinin,  
Nedîtine derd nizanîn,  
Xêrxazê me pak dizanîn,  
Bê gumanim, delala min,  
Werê bibe bermalîya min.

Bendê xayîn, har gellekin,  
Herro piş min xeyba dikin,  
Qet lomana ji min nekin,  
Bê gumanim, delala min,  
Werê bibe bermalîya min.

Hevra bidin huba dilan,  
Bivin mîna gul-bulbulan,  
Dive bîrkin derd û kulan,  
Bê gumanim, delala min,  
Werê bibe bermalîya min.

Qadir dibê dunê haye,  
Tu kesîra mulk nemaye,  
Qe na bijin eşq û şaye,  
Bê gumanim, delala min,  
Werê bibe bermalîya min.

1986

## AX DÊMARÎ, DÊMARÎ!

Eman, eman wey eman,  
Ax dêmarî, dêmarî!  
Halê zarêm kir yeman,  
Ax dêmarî, dêmarî!

Hêlandîkê ba nake,  
Zarê virnî şâ nake,  
Ebûr tune şerm nake,  
Tu wext çayê germ nake.

Bê dangeye, bê dane,  
Çawa çollê gavane,  
Zara dixe hilnayîne,  
Mîna mîya nebane.

Eman, eman wey eman,  
Ax dêmarî, dêmarî!  
Halê zarêm kir yeman,  
Ax dêmarî, dêmarî!

Ji vir-viza têr nabe,  
Çiqas divêm xêr nabe,  
Bê şer ji xew ranabe,  
Her çi dikim çar nabe.

Welle-bille terpeke,  
Şer-dewara ew pake,  
Tiştê bi tem vedşêre,  
Xewle dike vedhêre.

Eman, eman wey eman,  
Ax dêmarî, dêmarî!  
Halê zarêm kir yeman,  
Ax dêmarî, dêmarî!

Ew karatê hîn dibe,  
Zar dîtinê dîn dibe.  
Ewê malda tişt nehîş  
Zar bela kir, pişt nehîş.

Min çav korî gur anî,  
Li nav zarêñ xwe danî.  
Ew fêlbaze, zef zore,  
Qadir bi wê nikare.

Eman, eman wey eman,  
Ax dêmarî, dêmarî,  
Halê zarêm kir yeman,  
Ax dêmarî dêmarî.

1987

## WEYSETÊ MİN

Gelî qewman, ez bedhalim,  
Dilêm sare, negrîn, bese.  
Çardara min bixemlînin,  
Rîyam dûre, negrîn, bese.

Qedir-rûmet hêstra nîne,  
Fêlê kotî şera tîne.

Dewran heye şane-şîne,  
Dunê dore, negrîn bese.

Heta xwaşim min hiz bikin,  
Ez mirinê fêla nekin.

Mirîyanra pak, pîs yekin,  
Felek kore, negrîn, bese.

Mirin ku hat ew bê çare,  
Para benda axa sare,  
Kî şâ dibe gunekare,  
Bi azare, negrin, bese.

Zarêm hûrin, dil birîne,  
Bila xûşkam bigerîne.  
Birêm ji mal min derîne,  
Felek zore, negrîn, bese.

Silêymînra dunya nema,  
Zemîn qerar daye lema.  
Ez mirinê wera teme,  
Kî serxare, negrîn, bese.

Bavêm, dîyam, jin kêderê,  
Gor-kefenkin min wê derê.  
Sederekê, Cormedorê,  
Misken wure, negrîn, bese.

Derdê kurd û Kurdistanê,  
Dilda diçe goristanê.  
Hun bibînin gulistanê,  
Kî serkare, negrin, bese.

Rojekê bê kurdê şabin,  
Gulê sosin al, hêşînbin.  
Xayîn, xedar, îdî nabin,  
Xwedê jore, negrin, bese.

Qadir, wextê xatirane,  
Emrê ji me çêtirane.  
Ruhistîn hat bê mikane,  
Wir sêl sore, negrîn, bese.

## MENAL DİLO

Rozgara min minra nehat,  
Xweş roj nedît sêfil dilo,  
Derdê bendê xayîn, xedar,  
Te girt merez, derd, kul, dilo.

Êla rengîn bû dero-der,  
Mal, dewletam tew çû heder.  
Welat xerîb, yar sewdeser,  
De binale bedhal, dilo.

Ew zozanê bi çem, kanî,  
Kerîyê qerqaş kar, berx kanî?  
Kete destâ xêr-bêr, xanî,  
Te dît dew, doz sed qal, dilo.

Zû mir jinam ketme zaran,  
Dil bû kana kul, azaran.  
Hewcî bûme qelp, dest xaran,  
Lema ha zû bûm kal, dilo.

Çerx felekê mital xar kir,  
Bê miraz bir dilêm sar kir,  
Nekes, nemêr, ber min har kir,  
Xiste hepsê, girt dîl, dilo.

Zarê bê dê, mala giran,  
Teng kir li min dunê, dewran,  
Berbi kê çûm bûme heyran,  
Wan ez dame kefil, dilo.

Xêrxwez, bira, qewm, dost û yar,  
Te kir dijmin bextê bê kar.  
EZ vejandim wek gurê har,  
Kezev xwerin şel-şel, dilo.

Jinam ku mir dosta berê,  
Nehate mal bê îtbarê,  
Tev şirîkan bû neyarê,  
Wê qewl danî bin sel, dilo.

Min sewda da nuxsa, gêja,  
Bê şerm, bê ar, qewlik bêja.  
Rojên giran teng avêja,  
Vekşîn dûr çûn ker, lal, dilo.

«Qijik» nehat min «bet» anî,  
Elkek zêde malda danî.  
Wan bela kir mal, kar, xanî,  
Birîn li min şemal, dilo.

Dosta berê bir vekişî,  
Jina nû hat navda meşî.  
Wan nikarbû min bext reşî,  
Dane davêm qifil, dilo.

«Qijika reşva» «beta kûrsor»,  
Dilêm sotin herda dor-dor,  
Yekê mêtjû, ya din ruh xwar,  
Ez kuştım bê mertal, dilo.

Ne li «Xatê», ne jî «Fatê»,  
Kula reş kor herdu hatê.  
Heta roja axîretê,  
Minra lêdan dihol, dilo.

Ji bextê min herd jî dîniñ,  
Sixtê wana xilt birînin,  
Zarê sêwî natemlînin,  
Ew nabin bê emel, dilo.

Ev êş û jan, ev kul-derda,  
Şerê fila, rev, bez serda...  
Sed car zedê yar nemerda,  
Ça tû kirin pûl-pûl, dilo.

Ber kê bûme mûm û şima,  
Wan dane min derba rima,  
Jina xayîn, qewmê tima,  
Ça tu kirin betal, dilo,

Herro dibêñ bide, weyne,  
Herek xwera dikişîne.  
Qet nabêjin zar sêwîne,  
Wanda tune îgbal, dilo.

Carna tev-hev bûnê rengêm,  
Bilind, bi rik hatinê dengêm,  
Maç dikirin destêm, lingêm,  
Xwe didîtin mecal, dilo.

Mal, dewlet çû, ew ji sar bûn,  
Wan ci dixwast nebû har bûn.  
Tev nekesê mital xar bûn,  
Minra gerîn ecel, dilo.

Menî anîn ji her derê,  
Xwestin zêrê heyna berê.  
Min got tune nehatin rê,  
Herdî bûne decal, dilo.

Kê pirr digot xwaşbî Motî,  
Hezar carî can-can gotî,  
Dewlet red bû bûme «kotî»,  
Ser wan mame metel, dilo.

Bi malo, bi xatî, xalo,  
Bê guneyo, bê zewalo,  
Dosto bê malo, ker-lalo,  
Ha bê keso, bê êl, dilo.

Qewmê durû, jina dil sar,  
Minra dar pişt nebû tu car.  
Min kar da kê, ew bû neyar,  
Wextê minî ahal, dilo.

Xêr nedîtê evî dilî,  
Dor van jinan dimil-milî,  
Destê wanda wek rûn helî,  
Ber lingê wan bûm hol, dilo.

Fend û fêllê jinebîya,  
Neyê serê gurê çîya,  
Sêwî dane bal sêwîya,  
Pişt li min bû wek nel, dilo.

Zulma min dit nedit kesi,  
Vir, viz, dizî, hezar pisî...  
Te peçinî lê kire sî,  
Te ez kirim rezîl, dilo.

Her çêlekê dotin dibe,  
Lê her gilî gotin nabe,  
Malda fêlbaz, dest xar hebe,  
Bê feydeye al dîl, dilo.

Dunê heqe, xane pûçe,  
Dewran dore, bi ten, niçê,  
Lez-bez, bê kar, emrêm diçê,  
Xapxapoke mal, hal, dilo.

Ya li minê, ha li minê,  
«Qijik» seva malê dunê,  
Bû xulma yekî dinê,  
Lê minra bû gorkol, dilo.

Ya deh salan mal bûk mayê,  
Seva zaran mêt berdayê,  
Min ew şakir keç-kur dayê,  
Lê wê da min sed pel, dilo.

Min ew çê girt, xêrwez berda,  
Mal, hal dayê xan-man serda.  
Çû bal bendê, mital xarda,  
Ber min jor girt bîfil, dilo.

Gunêm zefe gel pirr zana,  
Berdestîya ber gavana,  
Ew tejîya nêçîrvana,  
Min xwest bikim xezal, dilo.

Eslê xweva pars pêşikê,  
Nesla xweva diz pişikê,  
Sonda dixwe nebî şikê,  
Malda nehîşt kinç, sol, dilo.

Kerkûlîya dest, ling heçe,  
Bê deng, bê hes, kûz-kûz diçe.  
Vekir orxan, doşik, buxçe,  
Tew nehîşt bê çengel, dilo.

Li ber mîyê çavê berxê,  
Dike derxe rû çarixê,  
Dor Nûranê dide çerxê,  
Ew weywîka çav pel, dilo.

«Qijika» reşê lêv deq-deqê,  
Pêçermoka gewrî beqê,  
Heram xwera nukul reqê,  
Xwera dîtiye berpal, dilo.

Dunê, alem tew dibêje,  
Bar na, serbar terş dukuje.  
Binêr, «qijîk» min davêje,  
Boy kutekî reş xal, dilo.

Çav şîlaqa, lîng hop-hopê,  
Teşik xara, tilî qopê.  
Bûm beyqûşa qirik zopê,  
Min ew kire kihêl, dilo.

Li rû heste, binva kêre,  
Talaş nake mal bi mère,  
Avê nadé, nan vedşêre,  
Rîyam birî fesal, dilo.

Rast gotine bav û kalan,  
Kurî felan, kûr li xalan,  
Pirsam davêm çewt û çalan,  
Ji kûr maye şikil, dilo.

Serê beraz li ser berrê,  
Ne edilî li tu derê.  
Tot bû kete nav gemarê,  
Wêda tune kemal, dilo.

Beroşa boy hezar mérî,  
Mêşa heram dorê gerî,  
Kete xurek rast ser sérî,  
Sikitî bû engel, dilo.

Nêçîrvanê zor nîşandar,  
Lêda xezal kir birîndar.  
Xezal revî bike sitar  
Rast hat beqa pil-pil, dilo.

Wek-wek kir got ziman lalê,  
Çi dixwazin li vê çollê?  
Min maralê, te xezalê...  
Kî kêra bû heval, dilo?

Kûr ax kişand got Xezalê,  
Ez dimirim ne ji gullê,  
Ji pirsa te, beqa gollê,  
Ket xwîn ber ma tel-tel, dilo.

Revîm ji dest gurê birçî,  
Ketme lepê evî hirçî,  
Bextê reş-heş, kuda diçî,  
Dikin te til, topal, dilo.

Nemerd derket çû dêmarî,  
Sêwik serda hîşt serbarî,  
Derdêm yek bû, bû hezarî,  
Tabke bext reş melûl, dilo.

Gelî benda, ev ci hale,  
Dê xwaş sêwî kale-kale?  
Li ber çavêm dax dinale,  
Daxê dews hîşt zol-zol, dilo.

Wê zar, avît digot qize,  
Zara bê dê nize-nize.  
Vê sosretê kî dibîze,  
Minra dibe hemgel, dilo.

Wê şeş zar hîşt, hate mérda,  
Yek ji bal min anî serda,  
Sêwîyê malam ji dest berda,  
Dida zarêx noxil, dilo.

Bi mal halêm ew banîya,  
Şîrê bera lê kelîya.  
Wê wêran kir navê dîya,  
Keçam bê dê hîşt mal, dilo.

Zara ew pak nas nedikir,  
Hate bal min zar bûn şekir,  
Minra digot kinca bikir  
Xwe par dibir gustîl, dilo.

Xûy-xeysetê ewê yarê,  
Wek teyrokê dev biharê,  
Wes-wese bû hundur, xarê,  
Wê dînêra bûm qûl, dilo.

Min ha digot yar xedare,  
Dil, te digot bi îtbare.  
Bê şer, bê dew bû neyare,  
De bikşîne, çav qûl, dilo.

Xwêş roj bîr kir yar dem-demê,  
Çû bû dijmin har bêxemê.  
Hûb-hizkirin bir bê temê,  
Da min jer-mar, gol-gol, dilo.

Çavnebar bû bê murvetê,  
Ya xwe dikir bi hucetê,  
Seva gerê gote-gotê,  
Minda nehişt dest, mil, dilo.

Nele kezev, dil firoşa,  
Mêr, keç, nav deng kê da rewşa.  
Heta axê qet nebe şâ,  
Kê tu kirî zelûl, dilo.

Wê zar avît, ez navêjim,  
Boy kezevê dîn, har, gêjim,  
Evê zulmê ezê bêjim,  
Heta bivim qewal, dilo.

Kê li min kir ew têr nexwe,  
Jer vereşe, xwînax vexwe,  
Felek wê jî mînam bixe,  
Weke hevbin helal, dilo.

Bendê xayîn, bext lê reshe,  
Şîn serda bê, gêjbe, fehşbe,  
Zar bê girtin, ziman şasbe,  
Qiromekbe, kût şil, dilo.

Nebendîya kî li min bîne,  
Beden girbe, çav nebîne.  
Tilî negire xwe bixurîne,  
Bê kes bive zayîl, dilo.

Dîsa tabke, sebrax bîne,  
Pîsî dore ha namîne.  
Xwedê jorda pak dibîne,  
Guman ma jor, menal, dilo.

Agir negre neşewite.  
Jina bê zat mixenete.  
Zar gumanin dîsa bi te,  
Rabe eslan, şêr kel, dilo.

Dil, te digot ezî şêrim,  
Dijmin, penîr ez ji kêrim,  
Tu nabirî li te xêrim,  
Dewr bi dore delal, dilo.

Mal bela bû hewar, hayê,  
Ha jê birin serda nayê,  
Tew dalastin mîna xoyê,  
Minra hîştin şel-pel, dilo.

Van jinokakan ez rind dotim,  
Wek zêwiran her tim mêtim,  
Ji dest xistim ez avîtim,  
Hê çûn bûne ber mal, dilo.

Dil agre natemire,  
Ew ku şikest nacebire.  
Ev jinokokê mal xur bire.,  
Herin xwekin şel-mel, dilo.

Kanî nayê ew dewrana,  
Hatî, çûyî wek kewrana,  
Dengê qurban, can, heyvana,  
Ta nabihîzim zelal, dilo.

Jina bê şerm, bê esil-zat,  
Qumaş lêkî herro sed qat,  
Roja xîret, namûsê hat,  
Yê te bavê tel, fel, dilo.

Mêrxasê çê, bi sed mêtî,  
Dijmin bike qûl û cêrî,  
Jinê bavê wî ser sêrî,  
Yê dîl bide teffîl, dilo,

Her kerr, gêjê nisla dîna,  
Ne yê şaya, ne yê şîna,  
Quncikada mîna jina,  
Min pîs dikin guh bel, dilo.

Mirî meytê li nav saxa,  
Dax dane min li ser daxa,  
Îro divêz ezim axa,  
Her nemêr, her dev dûl, dilo.

Kundê kerr, kor hildan cî-war,  
Ez belabûm tew ma neyar,  
Ax û zaram girt best, beyar,  
Xwîn, xeta tê tim bal, dilo.

Bendê xayîn, qelp, bê îtbar,  
Dexes, durû, him çavnebar,  
Quran dêstda qatbe sed car,  
Ew nabin pak mital, dilo.

Min dunya kir êrî-bêrî,  
Min çi digot hate sêrî,  
Îdî nebe qûl û cêrî,  
Şahê şêwran, bilbil, dilo.

Menal, weyne eşqa berê,  
Ça şabûyî li kêderê?  
Ev êş û jan dibe derê,  
Dîsa bibî cihal, dilo

Her çi bû çû, dilo, bîrke,  
Kutasîyê Xwedê xêrke,  
Emrê minra bese şerke,  
Bide destâ sor gul, dilo.

Bese bîrke derd û kulan,  
Rabe here baxçê gulan,  
Boy xatirê wan bilbilan,  
Şabe bibe hel-mel, dilo.

Qewm, lêzimê femke mîrî,  
Derd zanekî hiş li sêrî,  
Heske li min veke dêrî,  
Bila veke bê fêl, dilo.

Neyarê min tev şirîkan,  
Dest davêjin her hûrîkan,  
Ber wan naşkêm tu dirokan,  
Derbazbe jî sed sal, dilo.

Qadir Motî ber vî halî,  
Çerx felekê dor hîş xalî,  
Bû kewanî, him bermalî,  
Kûr mezêre delîl, dilo.

## KURÊM DÎÇE

Rewayî kurê xwe Rafîk dikîm

Fillê daşnak dest nakşînin,  
Qetlê dikin kurêm diçe.  
Wêran kirin bajar û gund,  
Xêr û xeznam, durêm diçe.

Şûşa, Laçin, him Xocalî,  
Filla zeft kir dilêm nalî,  
Hêsir birin mal man xalî,  
Êlam, obam, warêm diçe.

Hîvam, tavam, qudra ta min,  
Per-basikêm, taqeta min,  
Rojên giran qinyata min,  
Şêr, pilingêm, hurêm diçe.

Teyrê sîmir, baz-bilbilêm,  
Xêr, bereket, zêrêm, lelêm,  
Pîrêm, pakêm, sebra dilêm,  
Çira çavêm, nûram diçe.

Oxram, qilbam, îmana min,  
Emrêm, ruhêm, gumanâ min,  
Şev-ro gula ber bîna min,  
Apêm, bavêm, birêm diçe.

Wî vêdixist kuçkê bavêm,  
Bilind dikir her tim navêm,  
Zar-zimanêm, tema devêm,  
Şekir-şerbet xurêm diçe.

Qadir Motî dua dike,  
Xwedê xwe-xwe wî xayîke.  
Daşnakê har zû xezake,  
Bi top, tifing nerêm diçe.

## DİRÂV DİKE

Mîlyon salî, dewr- bilida li ser dirav qal û cenge,  
Dirav bal kê nebe ewa belengaze, him bê denge.  
Îro dibe, sibê nabe, ew ser destâ qirêj, zenge,  
Bendê hejar bê guman bû, malê davê dirav dike.

Vê dunêda pirr dewletî zor serkarin, bextewarin,  
Çi hezdkîn wê jî dikin, ew qewatin, hukumdarin,  
Gelên şivan, gavan, timê bin desteda xizmetkarin,  
Kire dijmin, mîr bal jinê, kur bal bavê dirav dike.

Dirav erzan lel dikire, baha zêrva zîv difroşê,  
Erdê dirav hebe li wir ulmê alim zanbûn boşe.  
Dewletî tim eşqê dike, wîra zeman, dewran xweşê,  
Li her derê rutba bilind li vê gavê dirav dike.

Qadir, kara bendê xêrxwaz xwedê tim bê dirav rastke,  
Bendê nemerd, nemam, bê qulp, bacê medê, wana naske.  
Fêllê kotî kar dernayê, tu tim keda helal hezke,  
Keda helal, bê kar, erzan weke avê dirav dike.

## NAYÊN

Filla zulm kir der bi der bûm,  
Xerîb ketim xêrxaz nayên.  
Mal-dewletam talan kirin,  
Hewar dikim serbaz nayên.

Dilêm bûye teltê xwînê,  
Pirr bedhalim dost, nas nayên.  
Mala giran, zarêن bê dê,  
Jinê dil sar, sêrbaz nayên.

Cî-warê nûh, bendê nenas,  
Qewm-lêzimê fêlbaz nayên.  
Rozgara pîs çolla xistim,  
Bext razaye naz-naz nayên.

Çerx felekê çerx vegerand,  
Bi şûr, dar têñ, bi saz nayêñ.  
Ber didimê havî naçin,  
Ber digerim gulnaz nayêñ.

Reşbe rûyê tunebûnê,  
Der-cînar bi hewas nayêñ.  
Rozgara ha here neyê,  
Don, dûv tune dilhez nayêñ.

Min nizan bû dewrê ha bê,  
Der-dor bûne îblis nayêñ.  
Nifra kîye ser min maye,  
Bendê gêj têñ dil xas nayêñ.

Nebîranê bendê xasim,  
Durrû, dir têñ, durnas nayêñ.  
Ew bendê ku min kar danê,  
Qet ji wana hes-bes nayêñ.

Melek, xezal xwe vedşêrin,  
Qijik, bûm têñ, kew, baz nayêñ.  
Bese Qadir kûr dinalî,  
Xêr-kar nebe tu kes nayêñ.

## NEMA

Çerxa felek dewr welgerand,  
Delal pirr bûn hurmet nema.  
Bi fend-fêlla gel xapandin,  
Qadir, hêja, rûmet nema.

Bikir-firoş wek gurê har,  
Talan kirin gund û bajar,  
Fêlbaz, birçî, bûne tucar,  
Xêr, bereket, murvet nema.

Her tişt baha bê îlacî,  
Rozgar xerab ber her xercî.  
Delal didin sivik, nîvcî,  
Wanda namûs, xîret nema.

Dûr revîn ji keda helal,  
Por kur kirin jinê dellal,  
Lêv sor kirin bûne decal,  
Bal wan ebûr, îsmet nema.

Maffîyoze rût bê gore,  
Ew bê eslê, diz bê tore,  
Gava davêñ fire-fire,  
Bûne beg, xan qudret nema.

Durû, dexes, her bê îtbar,  
Xeyset xerab, bê bav, bê war,  
Bertil danê bûne serkar,  
Nan-risq birrîn, qismet nema.

Qadir Motî, xêr ha nabe,  
Mezin ser pê, çûk ranabe.  
Rûspî, bav-dê çawa şabe,  
Bona şermê, şîret nema.

## DESTÊM

Zûva pir-pak xebatkarin,  
Xêr, bereket, barin destêm.  
Mîna bira li bal hevin,  
Wek pellewan zorin destêm.

Erdê, esmîn, çîya, banî,  
We ava kir, çêkir xanî.  
Nexşê wana we lê danî,  
Gelera kêr warin destêm.

Hînbin her car bigirin gulan,  
Bidin tosin û bilbilan.  
Qet hilnedin bomba, gulan,  
Qencî wera karin, destêm.

Destên hevra tim qewate,  
Karê dide dil rihete.  
Keda helal bi qudrete,  
Minra qismet, parin destêm.

Qadir Motî, vê dunyayê,  
Gulekêva bahar nayê.  
Destê tenê deng dernayê,  
Lema îro sarin destêm.

## HÊDÎ-HÊDÎ

Gelî gela ez helandim,  
Ewê jinê hêdî-hêdî,  
Heta axê ez nalandim,  
Ewê jinê hêdî-hêdî.

Kete nav me wek gurê har,  
Bi vir-viza pir kir neyar.  
Kire dijmin qewm, dost û yar,  
Ewê jinê hêdî-hêdî.

Piş min kennî, rûda nalî,  
Kom bela kir, dor hîş xalî,  
Nolî mara li min alî,  
Ewê jinê hêdî-hêdî.

Min ew anî bê hiş, hurri,  
Xwera bê wext kefen kirri,  
Ji şîn, şaya rîyam birri,  
Ewê jinê hêdî-hêdî.

Destê wêda şivdar, singe,  
Li ser serêm tinge-tinge.  
Bû pellwan danî binge,  
Ewê jinê hêdî-hêdî.

Xurek nepet, çay germ nekir  
Malda tu wext nan tem nekir,  
Gunda gerî qet şerm nekir,  
Ewê jinê hêdî-hêdî.

Navê minî wek xanekî,  
Serî, kezev, ser canekî,  
Tew erzan kir da nanekî,  
Ewê jinê hêdî-hêdî.

Bese menal, Qadir Motî,  
Nabe horî beqa kotî,  
Bal şirîka tu firotî,  
Ewê jinê hêdî-hêdî.

## EZ NİZANİM DİYAM KÎYE

Bi zaravê keça xwe

Sewdesera dil kevirê,  
Ewlad teme ji bav, birê,  
Çi mital kir te bê xêrê,  
Ez nizanim gunêm çîye?  
Qet nasnakim dîyam kîye?

Ez bê zarim, bi zewalim,  
Boy huba dê pir dinalim,  
Kerba nexaş tim bedhalim,  
Ez nizanim gunêm çîye?  
Qet nasnakim dîyam kîye?

Dunya, alem tew dibîne,  
Zarê bê dê tim bi şîne:  
Aykêm tera qet nemîne,  
Ez nizanim gunêm çîye?  
Qet nasnakim dîyam kîye?

Dewran xerab vê revêda,  
Dor me neyar pêda-pêda.  
Te ez hîstîm, dame kêda,  
Ez nizanim gunêm çîye?  
Qet nasnakim dîyam kîye?

Bê însafê, dê ha nabin,  
Dê bi kezev, dê bi tabin.  
Xêrxwaz, rûspî, alim rabin,  
Ez nizanim gunêm çîye?  
Qet nasnakim dîyam kîye?

Te por kurê çîma mîr kir,  
Hema mîr kir, hezar sêr kir,  
Sêwî hîstîm te ci xêr kir,  
Ez nizanim gunêm çîye?  
Qet nasnakim dîyam kîye?

Min nizan bû tê ha bikî,  
Har neyaran li me şakî.  
Ji vê karê qet şerm nakî,  
Ez nizanim gunêm çîye?  
Qet nasnakim dîyam kîye?

Dîya zarêñ xwe davêje,  
Yanê tîrb kol, yanê gêje,  
Evê zulmê gel, êl bêje,  
Ez nizanim gunêm çîye?  
Qet nasnakim dîyam kîye?

Xal-xatîya rîyam birrîn,  
Ez firotim, lê tu kirîn,  
Ber vê zulmê êl digirîn,  
Ez nizanim gunêm çîye?  
Qet nasnakim dîyam kîye?

Xezal bê kar kale-kalin,  
Bilbil bê gul nale-nalin,  
Te nabînim ev çend salin.  
Ez nizanim gunêm çîye?  
Qet nasnakim dîyam kîye?

Qewm-lêzim tew agadarîn,  
Der-dorê te qelp dil sarin,  
Wana ruhê bavêm xarin,  
Ez nizanim gunêm çîye?  
Qet nasnakim dîyam kîye?

Qadir Motî, ax mekşîne,  
Daykê hara nele bîne.  
Mîrêm jorda xwe dibîne.  
Ez nizanim gunêm çîye?  
Qet nasnakim dîyam kîye?

## BİLBİLA DENGBEJ

Ewlad rewşe, cî-war dike qulistan,  
Wedelîye hebûn çawa bax, bostan.

Tebîyet xezneye, boy gel hatîye,  
Tim xandîya lel, durrê wê dîtîye.

Wê xeznêda xêr û gune razaye,  
Şer-dew erzan, ulmê wê zef bahaye.

Ruhber tew diçine ber derê xeznê,  
Rutbê hildin nav bimîne li dunê.

Derê xeznê ber her kesî venabe,  
Nezan, ewter, tu wext ber wê şa nabe.

Ew bi sêre mift bi kilam vedibe,  
Ber vê xeznê xwendî, zane şadibe.

Qijik, qirik, teyr-tu, gişk tev hatibûn,  
Tezî, pêxas, li ber dêrî çit bûbûn.

Li vir baz û bilbil xerîb bê piştbûn.  
Lema herdu heval betal hîştibûn.

Zeft kiribûn xezne, gêjê qer lîbas,  
Nedhîştin pêşda bê alim û durnas.

Qijika reş bêflax jor girt lez-bez hat,  
Kanî wek min serok, mîrxas zor qewat?

Melûma reş dikir qîrrîn gêje-gêj,  
Digot-vira ezim şayîr û dengbêj.

Vî welatî ezim mezin, hukumdar,  
Bê fermanam kes we bernade tu car.

Qijika reş bûmva teyrê tengavêj,  
Ji xeznê dûr xistin bilbila dengbêj.

Ew dexesî kesên wura xweş nehat,  
Bilbila çük hevraz, berjêr zef çû-hat.

Çû mitala kerba kire nalînî,  
Zef gerand kilam got, girî, şîn danî.

Eva zulma Bazê bira dûrva dît,  
Ber qijikê sekînî kire fîte-fit.

Baz got: wêda herin ewterên gêj-mêj,  
Rê bidin bila bê bilbila dengbêj.

Ew dizane sêra xezna kal-bavan,  
Sêr venabe viran, vizan, lafavan.

Kanê qam û reqas, govend dengê we,  
Helbestada kanê hang û bangê we.

Wana dît ku bilbil, baz hev nas dikin,  
Hevra hurmet dikin, hev hemez dikin.

Ev kara qenc xaşa nemama nehat,  
Ser hevra, ber hevra, yek çû, yê din hat .

Wana civad kirin, qirar derxistin,  
Wan nezana dîsa qamêx lêxistin.

Wan dixastin bilbil û baz sêfilbin,  
Sura wan venekin rusa – rezîlbin.

Van kifirê kotî, bê şerme, bê ar,  
Dora xezna sérê kiribûn gemar.

Ser hestûkî rût ew pey hev rêz dibûn,  
Vedjenîn, dikotin cot-cot fêz dibûn.

Qijik, qirik, bûma korva pêcermûk,  
Tev hev bûbûn pêl hev dikir mezin, çûk.

Keda heram, mifte xaşa wan dihat,  
Mirarek sê, çar car dikotin rehet.

Tebîyetê zulma ha temil nekir,  
Tofan rakir dunê, alem tev ba kir.

Şerê bê xêr gel, êl hemû bela kir,  
Têr û birçî, qenc û xerab xela kir.

Hev vejendin, talan kirin milletan,  
Dero-der bûn, bela bûne dewletan.

Bilbil jî hêşîr ket nedît halê geş,  
Wêra jî bû gismet rev-bez, roja reş.

Ew gerî, sêfîl bû kire ax û zar,  
Weletekî dinê xwera dît sitar.

Bi halekî giran wê dar-ber anî,  
Hêlîneka pir-pak miqimî danî.

Vî welatî kevotk, kew bû xeznedar,  
Wana hez nedikir dexes, çavnebar.

Vî dîyarî kêm bû qijik, bûm, qirik,  
Bê xwedan ber linga mabû pêçermûk.

Vir hestû tune bû wana bikota,  
Ser miraran hezar vir-viz bigota.

Bilbila çûk rokê çû mala serokvan,  
Derdê dilêx vekir tew kire eyan.

Serokvan bi hewas bilbil hilda bir,  
Şûna xeznê dûrva fesal nîşan kir.

Bilbil ji rev-beza gellek sêfîl bû,  
Lê ew pêxas nîbû, sol, gore lê bû.

Wê dest avît fiqê, tembûrê, sazê,  
Deşt û zozan, dîyar tew anî lerzê.

Çend miqamên sîyara bi hewas lêda,  
Dengê wêra çiya, banî deng dida.

Govend çûn, reqisîn, dor xezna sêrê,  
«Qaz-qazî», «Neynûkê», «Koçer», «Papûrê»

Boy van qama mifta sêrê zû vebû,  
Bilbila çûk eşqa leyîst pirr şabû.

Qam, kilambûn, sêra xezna dewlemend,  
Lema kilam gotin dirêj bû govend.

Rihan, sosin, gulên reng-reng, sor, gevez,  
Tew leyîstin, şâ bûn, zêde bûn dil hez.

Çend migamên fesal lêda teyrê baz,  
Ji derê dûr hatin werdek, qullinq, qaz.

Ji van dengê zîz, xweş dibarîn gul-nûr,  
Nav dengê bilbilê bela bû çû dûr.

Bilbil û baz herd tev ketne govendê,  
Qijik, qirik, teyr-tû tew kirne bendê.

Nêt-meremê bilbilê rind hate sêrî,  
Dexes, durû, nemam, tew bûne cêrî.

Nemerdan ji merdan hezar vir gotin,  
Pê nikarbûn rûda, pişda firotin.

Kal-bavê me pirsên xas, rind gotine,  
Kutasîya qelpa, dexesa tune.

Merdo rêda, qelpê dil xilt zerêda,  
Nemerda ber merda tim daye derda.

Hevalara kê kû bîra kûr kola,  
Rokê tot bû ketê xwe mîna hola.

Qadir, zef bêje ji van helbestan,  
Bila nemam, nemerd şermkin ji dostan.

## MERİVÊ NEZAN

Gellek gune bê kirdarin,  
Çav di cîda korin nezan.  
Qenc, xiraba cude nakin,  
Bê dil, hinav, sarin nezan.

Çiqas kincê bê form kurt, teng,  
Perçê rizî, kêmber bed reng,  
Kê sarva kir bê şer, bê deng,  
Ewê hildin, hurrin, nezan.

Ew nizanin şerm, ar çîye?  
Dijmin kîye, dost-yar kîye?  
Şîn-şayêda jêr-jor kuye?  
Ker-lal mîna darin nezan.

Pirsê giran, bi xem, bê xem,  
Cabê didin bê fem, bê fem.  
Wanra yeke bi tem, bê tem,  
Ji hurmetê dûrin nezan.

Qadir Motî boy nezana,  
Minet dike erş-esmana,  
Hinek hiş jî bidin wana,  
Îro doram pirrin nezan.

## VÊ DEWRANÊ

Rozgar xerab, bext, razaye,  
Mital xar kir vê dewranê.  
Rev-bez, ax-zar bû para min,  
Dilêm sar kir vê dewranê.

Bendê aqil serkar nebûn,  
Mêrxas xistin gede rabûn,  
Wayîk, qijik, be bav şabûn,  
Rûvî hâr kir vê dewranê.

Zulm dibare li ber çavan,  
Nayê birin nazyê xavan,  
Kur radibin rûyê bavan,  
Dil sed par kir vê dewranê.

Malên ava wêran kirin,  
Ked-hed, hebûn, zorê birin,  
Eşq û şayî, hub-hizkirin,  
Jera mar kir vê dewranê.

Here neyê ev dewrana,  
Ez xistime zar-zimana,  
Kedam diçe dû-dermana,  
Emrêm jar kir vê dewranê.

Ber çavê min mij-dûmane,  
Qenc bûna min bê gumane,  
Qadir çawa mal mîvane,  
Ruhêm bar kir vê dewranê.

## SEYÊ HAVÎ

Sekî havî bive rihet,  
Çû bin sîya erebê ket,  
Doça dtrêj raxist veket,  
Bê cefa dît war, mal, havî.

Rokê xweyê erebê hat,  
Got ez diçim maye xebat ,  
-Diçî here, meke minet,  
Bi rik rabû ser pîl havî.

Bi ten, bi niç got kel-bîne,  
Sîya ser min ya te nîne,  
Eva sîya doça mine.-  
Werimî bû wek fil havî.

Erebe çû sî ji berda ,  
Tavê tîrêj avît jorda.  
Ew serwaxt bû daye derda,  
Bê sî hê bû sêfîl havî.

Wî ber tavê ziman derxist,  
Kustînî kir, «zurne» lêxist,  
Doça dirêj li erdê xist,  
Gerî cîkî sî, şil havî.

Hinek bende wek vî seyî,  
Naşêkrînîn cefê dayî.  
Xwe-xwe dikin xwe bê xwayî.  
Heta dibin rezîl havî.

## KURÊM

Ji her karê pêşik başe.  
Pak hemêzke çawa şûşe.  
Bila nebên ewa şâše,  
Xwedan pêşik hure, kurêm.

Çerxa dunê şane-şîne,  
Hinek aqil, hinek dîne.  
Dew-dozada sebrax bîne,  
Pîsî deyne, dore, kurêm.

Meriv navex qet pîs nake!  
Ji navê pîs mirin pake,  
Bi xîret be, êlê şake,  
Bila bêjin nere, kurêm.

Vir sond nexwe tu serîyan,  
Mexapîne qet merîyan,  
Mesekine ber derîyan,  
Pêşikê ha gire, kurêm.

Dunê zûva pilekane,  
Hinek gavan, hinek xane,  
Xayîn, nemerd bi nîşane,  
Her tim qire-mire, kurêm.

Cîyên xerîb nav şirîkan,  
Zef nekeve pey hûrikan,  
Dûr bireve lêv sorikan,  
Fend-fêlê wan pirre, kurêm.

Tim avake, xebatkarbe,  
Welat hizbe, bi îtbarbe,  
Ava zelal, karîbarbe,  
Bila bêjin durre, kurêm.

Kurê minî aqil-kemal,  
Nemerdanva nebe heval.  
Şerê giran û qalime-qal,  
Yê dûrkeve here, kurêm.

Rind bibhîze Qadir Motî,  
Jina bê şerm, vir-viz, gotî,  
Bê esil-zat, nisla kotî,  
Mîna dara dire, kurêm.

## MEZİN NEBE

Dunêda tu hukumdar, qetilkar mezin nebe,  
Bona bendê paqış her xedar, har mezin nebe.

Mervê dil sax rind bijî, derdê giran nebîne,  
Bendê nepak, serberjêr, pasîxar mezin nebe.

Xweşbe best û beyar, deşt û zozan, mîrg û çîman,  
Nav gulên sor-gevezda hewşan, dir, mezin nebe.

Dunya şenbe, tew bibe cinet, gul û gulistan,  
Bê şemamok, bê rez, tu baxçe, dar, mezin nebe.

Hub-hezkirin zêdebe, keç-xort tew bextewarbin,  
Bendê fêlbaz, qelp, durrû, dilxedar, mezin nebe.

Dost û yarêñ bê îtbar, tu car pê guman nebî,  
Heta axê melûlbe, ew serkar, mezin nebe.

Bendê kotî, çavbirçî, zinêkar, diz û berdiz,  
Bê ìmanbe, ew heram, tek dindar, mezin nebe.

Xayîn, şeytan nebe, gur qet nexwe berx û karan,  
Cîranê pîs korbe, ew çavnebar, mezin nebe.

Hevalên para zêde xwera her tim hildide,  
Ked here qet kar nayê, qezenc, par, mezin, nebe.

Kî ku malên xerab, qelp, bi sondê vir difroşe,  
Tew here dû-dermana, redbe, kar mezin nebe.

Ew dersdarê bê kemal ulmê kûr nade zaran,  
Bive şivan, gavan, lê ew dersdar, mezin nebe.

Dunê tew bive aşiq, helbestvanê nav û deng,  
Şâîr pêxas, nezan, bê şerm, bê ar mezin nebe.

Nebe bomba atomê, dew û dozê bê mecal,  
Li vê dunê ulmdarê zîyankar, mezin nebe.

Redbe şerê dunyayê, qal û cengê dewletan,  
Li ber çavê dîyan til, topal, kor mezin nebe.

Qadir sêwî pirr dîtin, zulma ha kes nebîne,  
Qet nebe pake, bê dê sêwî zar mezin nebe.

## WEYNİN

Bavo, dayê dizewicim,  
Gul nîşanam herin weynin.  
Cîranê min gişk zewicîn,  
Eşqa dilêm herin weynin.

Dayê, bêje bavê minda,  
Bila nevê virda-wêda.  
Ewe şev-ro dilê minda,  
Xêr û xeznam herin weynin.

Delala min esil zate,  
Xesîya min bi hucete.  
Divê kanê dê, bavê te,  
Bêrîvanam herin weynin.

Cote guhar, bazinekê,  
Seeta zêr, gustîlekê,  
Divên weynin bivin bûkê,  
Poz xizêmam herin weynin.

Bengî bûme ez wê yarê,  
Dil hinavêm anî xarê.  
Şayê bikin vê biharê,  
Bext mirazêm herin weynin.

Ew kulîlka devê çema,  
Qadir heland taqet nema.  
Herin weynin nekin xema,  
Dû-dermanam herin weynin.

## ŞAİR

Şaîr hetev, him delale,  
Mîna tavê şewq-şemale,  
Ava kewser-sar zelale,  
Her wext paqîş, sixte şâîr.

Şaîr tacê dewletane,  
Eşqa dilê miletane,  
Def-dewata keç-xortane,  
Dil-miraze rex te şâîr.

Şaîr xezna lel û dure,  
Bera kûre, çemê gure,  
Li meydanê şêrê hure,  
Îman, guman bexte şâîr.

Sêra dunê, erş, esmana,  
Sêra benda zar, zimana,  
Kilît-mifta dewr-zemana,  
Qurne, dewran wexte şâîr.

Şaîr alim, mital kûre,  
Dûrdîtnoka dîrok dûre,  
Ew polaye, qelem şûre,  
Qadir, tim ser texte şâîr.

## WERÊ BARAN

Bê te najî gul-gulistan,  
Werê baran, werê baran,  
Gazî dike zozan, aran,  
Werê baran, werê baran.

Werê avde best, beyaran  
Qumıştanın, zer, zinaran,  
Bila şînbe belgî daran,  
Werê baran, werê baran.

Ba-bîrûskê mizgîn anî,  
Ji ewra te xanî danî.  
Bi te geşin çem û kanî,  
Werê baran, werê baran.

Li jor nûra erş, esmanan,  
Li jêr ruhê bax-bostanan,  
Bahar, payız, zivistanan,  
Werê baran, werê baran.

Keskcsora te qudrete,  
Mîna kona bi şurbete,  
Çilke ava te cinete,  
Werê baran, werê baran.

Mêrg û çîman te avdaye,  
Xêr-berêket tim bal teye,  
Qadir bi te eşq û şaye,  
Werê baran, werê baran.

## EVAN ÇAVAN

Çav nebîne dil nexwaze horî, perî, kar-xezalan,  
Guh dibhîzin, çav dibêjin, dilo here bal delalan.  
Ruh şâ nabe, çav têr nabe, dest neghêje xet û xalan,  
Can-cegerê min peritand, dil xwar, heland evan çavan.

Dîlbera min sûrvâlke, dilmilmile dûr dimeşe,  
Virda nayê ji weca wê hişêm firî, dilêm dêşe.  
Taqt nema, zar nagere, ez keribîm, rojam reşe,  
Ka hekîmam, pir fename, bê yar naland evan çavan.

Huba Leylê Mecnûn dîn kir, cû gerîya best, beyaran,  
Eşqa Şîrîn Ferhad hilda kulinq lêda li zinaran,  
Hesret dilda, miraz çavda hîş xayîn û çavnebaran,  
Mecnûn ezim Ferhad pirtir sed car teland evan çavan.

Çav neynikin, ew dijbêrin, sêv, hinarê bi hesretî,  
Sîngê beyaz, şemamokê ji cinetê hêcka hatî.  
Bejna zirav, dêmê sor, zer sewdeser kir Qadir Motî,  
Wek dewrêşan derî-derî dîn-har gerand evan çavan.

## BEXT MİRAZÊM, TEHMÎNE

Keça kurda nazûkê,  
Zar şirîna poz çûkê,  
Perîya çav kanîyan,  
Minra ava sar bîne,  
Bext mirazêm, Tehmîne.

Dêm ziravê, zerîyê,  
Were malam, horîyê.  
EZ nexwaşim bed halim,  
Minra sêva sor bîne,  
Bext mirazêm, Tehmîne.

Tu kûlîka baharê,  
Çav beleka dil sarê,  
Heland minda dil nema.  
Dilêx minra par bîne.  
Bext mirazêm, Tehmîne.

Ew ji gulan namîne,  
Mîna gulan bibîne,  
Qadir bê gûl har, dîne,  
Minra gula par bîne,  
Bext mirazêm, Tehmîne.

## POR ZERÊ

Lêlê keçê, dil sarê,  
Dîn bûm bona te yarê.  
Şev-ro dikim ah-zarê,  
Werê bal min, por zerê,  
Li min bike sitarê.

Delala min, çav reşe,  
Sûret sore, dêm geşe.  
Mîna kewa dimeşe,  
Werê bal min, por zerê,  
Li min bike sitarê.

Çav belekê dûr meçe,  
Bê te dinê dewr pûçe,  
Emirê bê kar zû diçe,  
Were bal min, por zerê,  
Li min bike sitarê.

Zar şirîna, poz çûkê,  
Dilêm kûr sot te bûkê.  
Bê însafê, rojekê  
Were bal min, por zerê.  
Li min bike sitarê.

Neyar pirrin deng meke,  
Por gulîya ker şeke,  
Min bext jarî zû şake.  
Were bal min, por zerê,  
Li min bike sitarê.

Kevotka min rû xale,  
Boy wê xalê çend sale,  
Qadir Motî bed hale.  
Were bal min, por zerê,  
Li min bike sitarê.

## KEÇ - BÛKÊN KURDAN

Bi xet, bi xêlî,  
Dêrê gul-gulî,  
Xwekir xemilî,  
Keç-bûkên kurdan.

Kofî kitane,  
Bisk lê badane,  
Ruhê xortane,  
Keç-bûkêñ kurdan.

Dest bi henene,  
Çav bi kildane.  
Morî-mircane,  
Keç-bûkêñ kurdan.

Zend bi bâzinin,  
Gulin, sosinin,  
Xecê û Zînin,  
Keç-bûkêñ kurdan.

Pişt bi kemberin,  
Sol bi qonderin,  
Guh bi guharin,  
Keç-bûkêñ kurdan.

Fino şirikin,  
Serî qotikin,  
Zêr lê gupikin,  
Keç-bûkêñ kûrdan,

Tuncik temorî,  
Qirik bi morî,  
Kenê şekirî,  
Keç-bûkêñ kurdan.

Kofi bi zêrin,  
Kurtik mexmerin,  
Ser mil bi cêrin,  
Keç-bükên kurdan.

Dême bi sorin,  
Tim dirêj porin,  
Rewş û nîgarin,  
Keç-bükên kurdan.

Êlek kespikin,  
Horî, melekin,  
Xizêm xeleqin,  
Keç-bükên kurdan.

Kaftî etlasin,  
Zêrê lê xasin,  
Qadir, mîrxasin,  
Keç-bükên kurdan.

## TE XEZALÊ

Delala min zûva ez te hez dikim,  
Dilê minda wer danîye te yarê.  
Te bedewê, te kevotkê nas dikim,  
Were bal min, bê însafa dil sarê.

Tu nizanî ez çi zulmê dikşînim,  
Xuzla rokê min Mecnûnî bibînî.  
Bê te şev-ro bi girîme, bi şînim,  
Leylê, qe na carkê şake min dînî.

Qewm, lêzim rabûn,  
Bûxçe hildan çûn,  
Qadir got şabûn,  
Xêlîya bûkê.

## CÎNARÊ

Tu rihana biharê,  
Te bê dosta, bê yarê,  
Bê qismeta bê parê,  
Cînarê, ha cînarê,  
Ez heyrana te yarê.

Cînara min delale,  
Ez kirime bedhale,  
Dermanê min li bale,  
Cînarê, ha cînarê,  
Ez heyrana te yarê.

Cînara min Gozele,  
Ew karc, ew xezale,  
Bengî bûme heft sale,  
Cînarê, ha cînarê,  
Ez heyrana te yarê.

Bedew rinda xal yeman,  
Ez helandim sal zeman,  
Bê te dîn bûm, el-eman,  
Cînarê, ha cînarê,  
Ez heyrana te yarê.

Por-gulîyan şe dike,  
Dilêm diso ba dike,  
Xelqê li min şâ dike,  
Cînarê, ha cînarê,  
Ez heyrana te yarê.

Cînara min bedewe,  
Xazginîyan lê dewe,  
Dibêñ bûka me ewe,  
Cînarê, ha cînarê,  
Ez heyrana te yarê.

Cînara min Meleke,  
Çav reşê, çav beleke,  
Gundê meda ew yeke,  
Cînarê, ha cînarê,  
Ez heyrana te yarê.

Cînara min mezine,  
Tetik tijî bazine,  
Nizam çima gazine?  
Cînarê, ha cînarê,  
Ez heyrana te yarê.

Lêlê, keçê cînarê,  
Dil kevira, dil sarê,  
Dilê Qadir ah-zarê,  
Cînarê, ha cînarê,  
Ez heyrana te yarê.

## BÊ YAR MEKE

Delala min dil xar meke,  
Min maşoqî dil sar meke.

Sewdeserê bezna teme,  
Min sêfilî dîn-har meke.

Huba te ez çolla xistim,  
Min hêşîrî bê war meke.

Bext, mirazêm li bal teye,  
Bê guman, bê sitar meke.

Qasid tera name dane,  
Ker bixûne eşker meke.

Carkê şake min evdalî,  
Bersîva min bê kar meke.

Şirîk, neyar dor me pirrin,  
Her nemamî îtbar meke.

Neyar ji min vir gotinê,  
Tu xwedêkî bawer meke.

Gunêm hebe minra bêje,  
Bal her kesî bager meke,

Minda nema hal, hereket,  
Qetla nehea tu car meke.

Rusa, rezîl, ewter bûme,  
Min bext reşî pişt xar meke.

Cot hinara bifroşe min,  
Baha, erzan bazar meke.

Yan hez bike, yan bikuje,  
Besse, îdî bêzar meke.

Werê bal min êl razanê,  
Xedarê min hisyar meke.

Herdu destêm bavê qeydê,  
Kir-kaş bibe hewar meke.

Cîkî xewle min vejene,  
Tenê dilêm sed par meke.

Êl girînê tu megirî,  
Heyfî, navêx serxar meke.

Bijangê te şîn danînê,  
Birû, biska xwîndar meke.

Meytêm hilde mede kesî,  
Tu veşêre şerm, ar make.

Yeke Qadir bê te najî,  
Wê dunêda bê yar meke.

## DELAL MEÇE

Tu xêr hatî delal meçe,  
Heyrana te mal, hal meçe.

Pêparê te ez şâ kirim,  
Kew- kewvotka rû xal meçe.

Gellek wexte te nabînim,  
Dîn, îmanam helal meçe.

Emrêm, ruhêm, per-basikêm,  
Eşqa dilêm qewal meçe.

Bê te şev-ro şîn-girîme,  
Hêsrêm bûne gol-gol meçe.

Ji huba te ez kesirîm,  
Bûme sersem, bedhal meçe.

Bejna zirav, dêmê sor, zer,  
Ez kirime betal meçe.

Sîngê qerqaş, enya kever,  
Daye çavêm şemal meçe.

Dîndara te qet têr nabim,  
Bê te bûme decal meçe.

Minra bike ken-heneka,  
Bext nûh daye mecal meçe.

Rozgara ha dest nakeve,  
Rind ketîye fesal meçe.

Min azakî ji derd, bela,  
Zû hemêzke menal meçe.

Min mîvanke baxçê gulân,  
Tera bibim bilbil meçe.

Nebîranê kulîka me,  
Bê te najim sor-gul meçe.

Bidî minda sêv, hinara,  
Ezê bibim cahal meçe.

Şemamokê paşla teda,  
Heta nekim xal-xal meçe

Xwezla rokê te bigota,  
Were bal min evdal meçe

Minê bida heft ocaxa,  
Nezir, nîyaz, xezal meçe.

Bê însafê hub ha nabe,  
Hub kanîya zelal meçe.

Her nemamî îtbar meke,  
Wanra nebe heval meçe.

Kûda diçî em tev herin,  
Tenê xewle ker-lal meçe.

Tê ku herî xaşî here,  
Bi mital, bi delîl meçe.

Yeke Qadir bê te najî,  
Min mehêle zelîl meçe.

## NEHAT

Esmera min gilî dabû,  
Ka qewlê me, dilsar nehat,  
Guh ser denga, çav li rîya,  
Dil keribî dildar nehat.

Birû kevan, bijang tîrê,  
Dilda lêda bi niştîrê,  
Dijmin şakir bê tivdîrê,  
Birîndar kir xwîndar nehat.

Der-cîranan piçe-piçin,  
Şirîk îro bi ten-niçin,  
Ji dil hezar mital diçin,  
Ev çi sure surdar nehat?

Qe na roja axiretê.  
Werê ser min bê murvetê,  
Ezê şabim şêx-melle tê,  
Quran destda dîndar nehat.

Qadir, wekî yar bihata,  
Hukmê qetlam yê bigota,  
Dil-hinavêm kûr bisota,  
Qayîl nebû serdar nehat.

## WARÊN ÎRO DEWATE

Warên iro dewate,  
Bext-mirazê keç-xorte.  
Heta sibê çûk-mezin,  
Can-can bêjin bilîzin.

Tev keç-xortê ber miraž,  
Çawa werdek quling-qaz,  
Heta sibê çûk-mezin,  
Can-can bêjin bilîzin.

Dara zavê dawşînin,  
Para bavê bişînin.  
Heta sibê çûk-mezin,  
Can-can bêjin bilîzin.

Geşbin çawa gul-bilbil,  
Govend herin şabin dil.  
Heta sibê çûk-mezin,  
Can-can bêjin bilîzin.

Hûn mîvanê bi şanin,  
Nav-nîşanê dewranin.  
Heta sibê çûk-mezin,  
Can-can bêjin bilîzin.

Kanî henna bûk-zavê,  
Destan sorkin vê gavê.  
Heta sibê çûk-mezin,  
Can-can bêjin bilîzin.

Herin bînin neynikê,  
Zû bigirin ber bûkê,  
Heta sibê çûk-mezin,  
Can-can bêjin bilîzin.

Berbû diçê bi leze,  
Bûkê derxin bileyze,  
Heta sibê çûk-mezin,  
Can-can bêjin bilîzin.

Hevra bêjin taş! . . taş! . . taş!  
Bûk dilîze ka şabaş!  
Heta sibê çûk-mezin,  
Can-can bêjin bilîzin.

Me ji wera bûk anî,  
Lê xelata me kanî?  
Heta sibê çûk-mezin,  
Can-can bêjin bilîzin.

Qadir tu jî bi guman,  
Tev van jinên bî ter-can,  
Heta sibê çûk-mezin,  
Can-can bêjin bilîzin.



# KENÊ BER GİRÎ

## RİNDA MALAM

Ji wextê Nûh destâ naşo,  
Pêşir, qirik, gemar qaşo,  
Salê carkê kinça dişo,  
Sora-zerê rinda malam,  
Lema diçê şûnda malam.

Ew şuxlê pir-pak nake,  
Xurek dike çawa lake.  
Fera naşo, wîrda pake,  
Sora-zerê rinda malam,  
Lema diçê şûnda malam.

Sol pîyada xişte-xişte,  
Zik tê xanê ew bê pişte,  
Bê goreye ev ci tişte?  
Sora-zerê rinda malam,  
Lema diçê şûnda malam.

Seva gerê diqil-qile,  
Şev razanê derd û kule,  
Heta sibê pile-pile...  
Sora-zerê rinda malam,  
Lema diçê şûnda malam.

Dike dewa al-qûmaşa,  
Begem nake tenê reşa,  
Heye - tune wêra heşa,  
Sora-zerê rinda malam,  
Lema diçe şûnda malam.

Gund digere mal bi male,  
Viza dike hale-hale.  
Wextê şuxul nale-nale,  
Sora-zerê rinda malam,  
Lema diçe şûnda malam.

Bal wê tune zarê şirîn,  
Xurêm kirye kul û birîn.  
Diçe gerê zar digirîn.  
Sora-zerê rinda malam,  
Lema diçê şûnda malam.

Dest qilêra vê nan pêjê,  
Vê kotîya qewlik bêjê,  
Serwaxt nakim evê gêjê,  
Sora-zerê rinda malam,  
Lema diçe şûnda malam.

Dîkê nîvro qîre-qîre,  
Çelek kêpda ore-ore,  
Ew razaye xore-xore.  
Sora-zerê rinda malam,  
Lema diçe şûnda malam.

Herro, her şev ew nexwaşe,  
Pak nizane kîder dêşe.  
Ew nexwaşa parî xaşe,  
Sora-zerê rinda malam,  
Lema diçe şûnda malam.

Herro dibê dirav, weyne,  
Ezê herim bikim deyne.  
Ji bazarê paşda nayne,  
Sora-zerê rinda malam,  
Lema diçe şûnda malam.

Şîşik, teşî nedîtiye,  
Deyne para min ketîye.  
Min nedixwast, xwe hatîye,  
Sora-zerê rinda malam,  
Lema diçê şûnda malam.

Kincê ser wê bişkivîne,  
Derzî tune, ta nabîne,  
Malda herro girî, şîne.  
Sora-zerê rinda malam,  
Lema diçê şûnda malam.

Se ber kêpda kûze-kûze,  
Bê nan, bê av dilewize.  
Gemar bejna sêva dûze,  
Sora-zerê rinda malam,  
Lema diçê şûnda malam.

Poz kartole, serî nîske,  
Xwarina wê teme-tîske,  
Goşt nebûnê îske-îske,  
Sora-zerê rinda malam,  
Lema diçe şûnda malam.

Mişkê bi nexş ustî bazin,  
Malda «qaz-qaz» «tans» dilîzin,  
Wan şadibe nake gazin.  
Sora-zerê rinda malam,  
Lema diçe şûnda malam.

Belebanê diran wek sûr,  
Dest yek bûne tev mişkê hûr,  
Mal tew birin bê deng, bê sûr,  
Sora-zerê rinda malam,  
Lema diçe şûnda malam.

Kincê kurtik bejna nîvçê,  
Ber neynikê qet dûr naçê.  
Benîşt dêvda qırçê-qırçê,  
Sora-zerê rinda malam;  
Lema diçe şûnda malam.

Mêşa malda bêsî dike,  
Li nav zexîr kurmî seke.  
Dûrva divên ci bûkeke?  
Sora-zerê rinda malam,  
Lema diçe şûnda malam.

Her danêda şeş nan xwerî,  
Ro kirîye li min tarî.  
Hesin dicû sarî-sarî,  
Sora-zerê rinda malam,  
Lema diçe şûnda malam.

Mirîşk tu wext zêde nekir,  
Kîjan girbû ustû jêkir.  
Pirtûka wan jê hil nekir,  
Sora-zerê rinda malam,  
Lema diçe şûnda malam.

Cawe-cenge sewdesere,  
Çoyê kotî kul kedere.  
Derdê wêya derda dere,  
Sora-zerê rinda malam,  
Lema diçe şûnda malam.

Porda sipî, kêç dibeze,  
Ne yek, ne çar «kerî peze».  
Kinca davê teze-teze.  
Sora-zerê rinda malam,  
Lema diçe şûnda malam.

Culet nakim pirsa bêjim,  
Mîna belga ber dihejim.  
Min dukute qet navêjim.  
Sora-zerê rinda malam,  
Lema diçe şûnda malam.

Ew nahêle ji mal herim,  
Mîna teyrê çivîk berim,  
Pelewane, pê nikarim.  
Sora-zerê rinda malam,  
Lema diçê şûnda malam.

Diçe gerê mal namîne,  
Qadir Motî ev car nîne.  
Xwedê jêra belê bîne.  
Sora-zerê rinda malam,  
Lema diçê şûnda malam.

## DERDÊ BÛKAM GİRANE

Kurêm mal-hal xerab kir,  
Heta niha ça tab kir?  
Kurêm ji wê newêre,  
Kurêm jine ew mîre  
Derdê bûkam girane,  
Jana dev û dirane.

Ew ku rûnişt ranabe,  
Derzî-dirûn pê nabe,  
Ev xetaye bûk nîne,  
Çar zar peye çûk nîne.  
Derdê bûkam girane,  
Jana dev û dirane.

Kincê kurtik ser çokê,  
Eşlan bükê, şer bükê.  
Ji şer dewan namîne,  
Pê nikarim bi kîne.  
Derdê bûkam girane,  
Jana dev û dirane.

Dev - lêvê xwe sor dike,  
Kincê zarêx lêname.  
Serwaxt nakim vê dizê,  
Heta nivro radizê.  
Derdê bûkam girane,  
Jana dev û dirane.

Bûkam yeman gurêxe,  
Nêzik neçe yê texe.  
Dest davêje tîna min,  
Zû dibire bîna min.  
Derdê bûkam girane,  
Jana dev û dirane.

Rûyê bûkam reş tenî,  
Qadir tû kir lêkenî.  
Derdê bûkam girane,  
Jana dev û dirane.

## MAL YA MİNE, TU KÎYÎ

Xasya mine hop-hopê,  
Teşik xara, dest qopê,  
Por gjikka, pişt kûpê,  
Mal ya mine, tu kîyî?

Çil çicika, çil ziman,  
Te fêlbaza bê ïman,  
Tu car nebe bi guman.  
Mal ya mine, tu kîyî?

Xasya mine çav sûtê,  
Bê dirana, dev rûtê,  
Rojê tera yek kûtê.  
Mal ya mine, tu kîyî?

Bê dangeyê, bê danê,  
Rojê bixwe yek danê,  
Bê xweya, bê xudanê,  
Mal ya mine, tu kîyî?

Tu avzaza pîrokê,  
Minra nebê çîrokê,  
Mal nemîne tek rokê,  
Mal ya mine, tu kîyî?

Mêr kirîye bigerim,  
Kuda hizkim ez herim.  
Kurê tera şev şerim,  
Mal ya mine, tu kîyî?

Qewm-lêzimêm gellekin,  
Bêjim yê te belakin,  
Dev-lêvê te qelakin,  
Mal ya mine, tu kîyî?

Mêrêm gilyêm divêje,  
Ew aqile, ne gêje,  
Tu wexta min navêje,  
Mal ya mine, tu kîyî?

Tera hurmet tek eve,  
Bê şer ji mal derkeve,  
Li ber dêrî bikeve,  
Mal ya mine, tu kîyî?

Usa neke hêrs kevim,  
Şiv-dar hildim te kevim,  
Berbi merzel te bivim,  
Mal ya mine, tu kîyî?

Bextê xasyê rind lêda,  
Ne kuşt bere çolêda,  
Kire holê gol lêda,  
Mal ya mine, tu kîyî?

Qadir, pîrê dest ketî,  
Bûkê helal şîr mêtî,  
Bê kutan, bê rik, êtî,  
Tu wext nabên, tu kîyî?

## JİNÊ VİZEK

Gilî, gazin, xeyba dikan,  
Jinê vizek li ser şîna.

Vira, viza ,sûca dikan,  
Jinê vizek li ser şîna.

Ew dibînin hevaloka,  
Hevra dibêن meseloka,  
Pirsa didin mîna «çêka»,  
Jinê vizek li ser şîna.

Hinek kincê sor xwedikin,  
Gulî, biskê xwe şe dikan,  
Nav-nûçika li hev dikan,  
Jinê vizek li ser şîna.

Malê xweda tu kar nakin,  
Şuxulê xelqê du nav dikan.  
«Dîplomatîn», «advakatin»,  
Jinê vizek li ser şîna.

Têl, radîyo gişk bal wane,  
Yek hukmete, yek dîwane.  
Xeberdin wek loxmane,  
Jinê vizek li ser şîna.

Xemê nakin malda şîne,  
Zik têr dikan pirê kone,  
Berjêr dikan kî ci bîne,  
Jinê vizek li ser şîna.

Qadir, jinê russa, bê şerm,  
Rûyê çarix qalim wek çerm,  
Viza dikin ker nerme-nerm,  
Jinê vizek li ser şîna.

## JİNÊ HÊWÎ

Nazyê wana nayê birîn,  
Vir-vizê wan nayê kirîn,  
Hevra şerin, dikin qîrîn,  
Gellek zorin jinê hêwî.

Mêr çi bîne bi gazinin,  
Heye, tune qet nizanin.  
Şeytan pirtir ew dizanin,  
Kula korin jinê hêwî.

Hêwîya pêşîn kote-kote,  
Hêwîya paşîn bi hucete.  
Yek agire, yek bizote,  
Derdê dorin jinê hêwî.

Bê kezevin, him dil sarin,  
Ji rûyê wan jer dibarin.  
Şer-pilingin, gurê harin,  
Kozîya sorin jinê hêwî.

Herek xwera dikişîne,  
Qadir Motî ji ku bîne,  
Malda herro girî, şîne,  
Kezev xwarin jinê hêwî.

## EZ MAME JÊRÊ

Dennê Dehokê,  
Mêvan çûm rokê,  
Ketme dewekê,  
Zar birin jorê,  
Ez mame jêrê.

Bona qerpalan,  
Neketme dilan,  
Ketne ber millan,  
Ber birin jorê,  
Ez mame jêrê.

Bendê kinc etlas,  
Birin bi hewas,  
Derva man durnas,  
Dar birin jorê,  
Ez mame jêrê.

Yekî bi papas,  
Nepirsî xas, nas,  
Jibart pak lîbas,  
Gir birin jorê,  
Ez mame jêrê.

Wanê bê pergar  
Serpê kirim dar,  
Wek bendê neyar,  
Dor birin jorê,  
Ez mame jêrê.

Sersemê serxweş,  
Digotin taş, taş,  
Kil-korê şaş-maş,  
Ker birin jorê,  
Ez mame jêrê.

Govend çûn keç-xort,  
Yekê kilam got,  
Yê din cêbam sot,  
Kar birin jorê,  
Ez mame jêrê.

Govend bû giran,  
Jorda hat baran,  
Çendê poz beran,  
Jar birin jorê,  
Ez mame jêrê.

Wan mîna guran,  
Hevxistin diran,  
Nexasê giran,  
Kor birin jorê,  
Ez mame jêrê.

Bextê minî reş,  
Nedît roja ges,  
Çendê neteres,  
Yar birin jorê,  
Ez mame jêrê.

Ez dame yekê,  
Şandin merekê.  
Wan tev Melekê,  
Nar birin jorê,  
Ez mame jêrê.

Zix heta çokê,  
Em çûn pey bûkê,  
Mala poz nîkê,  
Sor birin jorê,  
Ez mame jêrê.

Yekê kir qarîn,  
Yê din kir orîn,  
Rê li min birîn,  
Dirr birin jorê,  
Ez mame jêrê.

Min got bi gazin,  
Çima nabîzin.  
Lêv-sor, poz mezin,  
Zer birin jorê,  
Ez mame jêrê.

Wek rûvyê besta,  
Sinî ser destâ.  
Ling lê şikesta,  
«Jer» birin jorê,  
Ez mame jêrê.

Serxweş, gêj rabûn,  
Dînvirt par-par bûn,  
Mêvan dil sar bûn.  
Dir birin jorê,  
Ez mame jêrê.

Wan şerab hiza,  
Xwe dan ber hîza,  
Xwerin dan tîza,  
Hurr birin jorê,  
Ez mame jêrê.

Serxweş dirr hatin,  
Kêr, dar derketin,  
Sê-çar meyt ketin,  
Zor birin jorê,  
Ez mame jêrê.

Serxweşê bê ar,  
Derxistin jin, zar,  
Meclîs bû tar-mar,  
Mar birin jorê,  
Ez mame jêrê.

Hev hatin gefa,  
Zor dane lafa,  
Minra dan cefa,  
Har birin jorê,  
Ez mame jêrê.

Kerba çûme mal,  
Xwekir kincê al,  
Vegerîm ker-lal,  
Ez birim jorê,  
«Nerr» mane jêrê.

Qadir kir hewar,  
Vegerîn jin, zar,  
Derxistin bê ar,  
Ez birim jorê,  
Zîrr mane jêrê.

## XESÎ Û BÛK

Xesî: Lêlê bûkê, ez xesîme,  
Boy terpeka mar dasîme,  
Fend û fêllê te hesîme,  
Çima dayê gazî nakî,  
Derê malê gêzî nakî.

Bûk: Lê xesîyê, ez xas bûkim,  
Kinçek tune malda xukim,  
Qarê xelqê dengêx nakim.  
Metê, qazî dikî bike,  
Tenê tu min sückar meke.

Xesî: Lêlê bûkê, ziman jerê,  
Dê dêlikê, bav zir kerê,  
Bê rûmeta, sewdeserê,  
Çima dayê gazî nakî,  
Derê malê gêzî nakî.

Bûk:      Êla bavêm nav-nîşane,  
                Bavêm axa, xalêm xane,  
                Birêm teyrê ser destane.  
                Metê, qazî dikî bike,  
                Tenê tu min sückar meke.

Xesî:      Lêlê bûkê, cil zimanê,  
                Çelek doşa bêrîvanê,  
                Rûn, penîrê malê kanê?  
                Çima dayê gazî nakî,  
                Derê malê gêzî nakî.

Bûk:      Bê îmanê tu ne çûkî,  
                Bona mîrkî sera dikî,  
                Lema malda şuxul nakî,  
                Metê, qazî dikî bike,  
                Tenê tu min sückar meke.

Xesî:      Ber vê zorê, ber van lafa,  
                Zarê tera nadim cefâ,  
                Îdî meçe şaya, defa,  
                Çima dayê gazî nakî,  
                Derê malê gêzî nakî.

Bûk:      Lê xesîyê, şîn-şepûkê,  
                Şev decalê, ro pepûkê,  
                Dest qirêja pecermûkê,  
                Metê, qazî dikî bike!  
                Tenê tu min sückar meke.

Xesî: Lêlê bûkê, dev belayê,  
Te bê hişa xwe der dayê,  
Tu wext tera nayêm rayê,  
Çima dayê gazî nakî,  
Derê malê gêzî nakî.

Bûk: Xezûrê min bi hurmet bû,  
Bi tesîv bû, bi xîret bû,  
Ji derdê te ew mir red bû,  
Metê, qazî dikî bike!  
Tenê tu min sückar meke.

Xesî: Lêlê bûkê, bê hinavê,  
Şer-dewê me wêda bavê,  
Surra malê mede tavê,  
Çima dayê gazî nakî,  
Derê malê gêzî naki.

Bûk: Lê xesîyê, ser hejokê,  
Dirêj meke vê çîrokê,  
Ezê red kim te bi tokê,  
Metê, qazî dikî bike!  
Tenê tu min sückar meke.

Kurê pirê: Dayê, çima tu şer dikî?  
Me séfila dîn- har dikî,  
Tu vê qetlê boy mîr dikî,  
Dayê, qazî dikî bike.  
Tenê tu me sückar meke.

Şerê pîrê zef dirêj bû,  
Kûre pîrê navda gêj bû,  
Kete erdê hare-hej bû,  
Dayê, qazî dikî bike!  
Tenê tu me sückar meke.

Bûk û xesî bi hev ketin,  
Pirsê giran hevra gotin.  
Şîr û mastê malê rêtin,  
Dayê, qazî dikî bike,  
Tenê tu me sückar meke.

Xesî revî çû bal qazî,  
Hêsir rêtin bi sêrbazî,  
Çav kir qazî kire razî,  
Dayê, qazî dikî bike,  
Tenê tu me sückar meke.

Navçî hatin qirar danîn,  
Kur, bûk, xesî li hev anîn,  
Hev dalastin, bi hev banîn,  
Dayê, qazî dikî bike,  
Tenê tu me sückar meke.

Nesekinî kurê pîrê,  
Zû kutake vê tivdîrê,  
Çû pey melle bibre merê.  
Dayê, qazî dikî bike,  
Tenê tu me sückar meke.

Melle zû hat quran vekir,  
Mer zû birrî eşkere kir,  
Xesî, qazî herd tev şâ kir,  
Dayê, qazî dikî bike,  
Tenê tu me sückar meke.

Xesî kete millê qazî,  
Tev mil-milîn bi sérbazî,  
Hev maç kirin bûne razî,  
Dayê, qazî dikî bike,  
Tenê tu me sückar meke.

Wan «Qaz-qazî»qam-lêxistin,  
Neynik anîn, şam vêxistin,  
Bûk û zava tev derxistin,  
Dayê, qazî dikî bike,  
Tenê tu me sückar meke.

Bi def-zurne, bi xêrxazî,  
Reqisîn bi hewar, gazî,  
Xesî, anîn mala qazî,  
Dayê, qazî dikî bike,  
Tenê tu me sückar meke.

Qewm-lêzima temilandin,  
Dara zavê xemilandîn,  
Bal bûk, zavê edilandin,  
Dayê, qazî dikî bike,  
Tenê tu me sückar meke.

Xesî çû mêt hesret dêrket,  
Mal paqîş kir bi merîfet,  
Bax û baxçe kire qudret.  
Dayê, qazî dikî bike,  
Tenê tu me sückar meke.

Wek melekê di qudretê,  
Ew dûr man ji kote-kotê,  
Bi hev şâ bûn çûn cinetê,  
Dayê, qazî dikî bike,  
Tenê tu me sückar meke.

Xesî bona here mêtarda,  
Bûk davîte kozya sorda,  
Huba qazî ew da derda,  
Pîrê hê got gêzî dikim,  
Boy xatîrê qazî dikim.

Çiqas wexte ez bê mêt bûm,  
Ji rozgara sêfil têr bûm,  
Çûme mêtarda bextewar bûm,  
Derê malê gêzî dikim,  
Boy xatîrê qazî dikim.

Kutasîyê xesî rokê,  
Çû sekinî li ber bûkê.  
Te rast digot dûrdîdnokê,  
Derê malê gêzî dikim,  
Boy xatîrê qazî dikim.

Evê pirsê êl pê hesî,  
Bî mayîn karê nadê kesî,  
Qadir ha dît, ha nivîsî.  
Derê malê gêzî dikî,  
Boy xatirê qazî dikî.

## GAZİNÊ BÛKÊ

Lêlê keçê, min por kurê,  
Çiqas dikim ew nayê rê,  
Araq ku dît yê zû herê,  
Ji wir dereng bê his derê.  
Çi agir bû ez ketimê?  
Ew roj reşbe ez hatimê.

Pirr veduxwe, vedişe,  
Dike here diweşwişe,  
Lêxistine netik beşe,  
Destê wîda rojam reşe.  
Çi agir bû ez ketimê?  
Ew roj reşbe ez hatimê.

Ew veduxwe dike naza,  
Zorê dide vira, viza.  
Ker veduxwe mîna diza,  
Divêm nexwe, dide tîza,  
Çi agir bû ez ketimê?  
Ew roj reşbe ez hatimê.

Kasa berîn nakêlime,  
Kasa duda lap alime,  
Ya sisya da bû zalime,  
Ya çarada wey halê me.  
Çi agir bû ez ketimê?  
Ew roj reşbe ez hatimê.

Gellek şeva ew anîne,  
Serxoş, mirî mal danîne.  
Sibê çawa qet ew nîne,  
Şerm û ebûr bal tunîne.  
Çi agir bû ez ketimê?  
Ew roj reşbe ez hatimê.

Ruzê zara ji mal dive,  
Dide arax, konyak, pîve.  
Kase herro li ser dêve,  
Zênbûnêda gelek xave.  
Çi agir bû ez ketimê?  
Ew roj reşbe ez hatimê.

Mêro, nexwe bibe hakim,  
Nifirê xerab li te nakim.  
Huba dilêx tera vekim,  
Kul, derdê xwe bi te şakim.  
Çi agir bû ez ketimê?  
Ew roj reşbe ez hatimê.

## MÊRÊ KOTÎ

Belengaza min por kurê,  
Ez xapîyam hatime rê,  
Mêvan malda diçe gerê,  
Ez helandim mêtê kotî,  
Tu şîretke, Qadir Motî.

Qara zarê xwe nakşîne,  
Yê mîna xwe ji ku tîne?  
Malda êtî, girî, şîne.  
Ez helandim mêtê kotî,  
Tu şîretke, Qadir Motî.

Sewdesere dide çêra,  
Mîna gêja nizam kêra,  
Vira dike para, pêra,  
Ez helandim mêtê kotî,  
Tu şîretke, Qadir Motî.

Hebanê wî bê viz nabe,  
Mital qelpe, dil düz nabe,  
Korî-kurmî pişt kûz nabe...  
Ez helandim mêtê kotî,  
Tu şîretke, Qadir Motî.

Naxebite dirav nayne,  
Mêvan ku hat divê weyne.  
Ker-lal diçim dikim deyne...  
Ez helandim mêtê kotî,  
Tu şîretke, Qadir Motî.

Nevsok, tirsok, parsî xware,  
Ew mêtê nîne kul-azare.  
Minra şere gurê hare,  
Ez helandim mêtê kotî,  
Tu şîretke, Qadir Motî.

Diran tune serî rûte,  
Dev çewale, poz lê pûte,  
Heta sibê kote-kote,  
Ez helandim mêtê kotî,  
Tu şîretke, Qadir Motî.

Vî nexwaşî vî sîerxwaşî,  
Arax xwerî, neşe kaşî,  
Ez pîr kirim vî bext reşî.  
Ez helandim mêtê kotî,  
Tu şîretke, Qadir Motî.

Nahebîne min delalê,  
Sîng û berê min rû xalê.  
Lê peydabe qeda salê,  
Ez helandim mêtê kotî,  
Tu şîretke, Qadir Motî.

Wele gêje, bile gêje,  
Rojê giran teng avêje.  
Minet dikim, dîsa bêje,  
Ez helandim mêtê kotî,  
Tu şîretke, Qadir Motî.

## QERSO

Pêşekê xwe naterkîne,  
Der-cîran kir neyar Qerso.  
Ew durrûya şerm, ar nake,  
Bere hevda dost, yar Qerso.

Çavnebare, him dexese,  
Him nemerde, him nekese,  
Ro rûviye, şev dibe se,  
Li me birrî xêr-kar Qerso.

Pişda dijmin, rûda doste,  
Bal şirîkan piste-piste,  
Ew şeytana bûye hoste,  
Neda kesî tu kar Qerso.

Xêr-şerada, li bal nasa,  
Guhêx dide deng û hesa,  
Ew dikeve sed lîbasa,  
Qenca dike sückar Qerso.

Bal wî tune namûs, xîret,  
Bê xwîn-xeta nabe rehet,  
Digerîne bike firset,  
Bide qîrê dîyar Qerso.

Ew kezava çi tebaye,  
Carna şepûk, carna baye,  
Rastî, îman bal nemaye,  
Bûye kul-derd, azar Qerso.

Carna müşke, carna mere,  
Carna şeytan, carna kere,  
Bê insafe, bê îtbare,  
Anî zarê jin-zar Qerso.

Carna berdiz, carna dize,  
Pey kerîya kûze-kûze,  
Birçî manê dilewize,  
Bûye mêjo, şîrxwer Qerso.

Ne dimire, ne kal dibe,  
Ne kor dibe, ne lal dibe,  
Heban tijî tim bal dibe,  
Bê viz nabe tu car Qerso.

Wek kopeka ew bi bîne,  
Nebendîya ji dûr tîne,  
Virra dizê diqeysîne,  
Qadir kire dîn-har Qerso.

## ÇERXÊ

Cerxê yeman zalime,  
Fend-fêllada alime,  
Çil zimane, Feleke,  
Sero-pîya keleke.

Pêşik ji dê hildaye,  
Cerd û talan dil daye.  
Heban tijî vir-vize,  
Fêl kotîye, dest dize.

Xesî, xezûr hez nake,  
Nanê malê gez nake.  
Ew mezina nabîze,  
Çav ser tepê dillîze.

Baha, erzan napirse,  
Diçopîne natirse.  
Nebîndîya dibêje,  
Qetlêlez-bez dipêje.

Dûrva ramê davêje,  
Bira, birê bikuje.  
Ew şêre, ew pilinge,  
Ew dundula du linge.

Ji Rohilat-Roava,  
Çerxê dike du gava.  
Asya Navîn – Nexçivan,  
Rêza gunda bû mîvan.

Malo-malo pirr gerî,  
Cerd kuta kir vegerî.  
Wir çû mala Melekê,  
Melek xiste kelekê.

Melek didê nîşanê,  
Bibe bide Gulşanê.  
Bêje xûşka te daye,  
Boy eşqa we pir şaye,

Çerxê çawa xelat dît,  
Şabû kire fire-fît.  
Qirikêda kul hatê,  
Çav davêje xelatê.

Qirar danî çê ser ket,  
Xelat hilda zû derket.  
Hilda, danî zef bada,  
Xelat zeft kir ta neda.

Ew xelata nîşange,  
Çerxê kire sed binge.  
Qirareke nûh derxist,  
Çerxê golik ber gê xist.

- Herkê Melek zef bêje,  
Ezê bêjim ew gêje,  
Xasiya wê dibêje,  
Kincê ser wê qirêje.

Çerxê dizî kire bar,  
Nav-nûçik jî kir serbar.  
-Ew bê dêye, bê pişte,  
Ewa ber min ne tişte.

Dîya wêya mirîye,  
Mitala ew birîye.  
Dîyam qence, ez şêfim,  
Bi tîmarim, bi kêfim.

Sed rastê wê virekam,  
Wê mat bike surekam.  
Dîyam saxe ew besse,  
Ez çi bêjim esase.

Rojê dijwar dîya min.  
Şemal dike rîya min  
Ew jin nîne, ew mère,  
Ez çi dibim vedşêre.

Ew donê gur kê dixe,  
Wana ji rê derdixe.  
Dike nivişt, bendika,  
Dixapîne kendika.

Xewle dibe rex merzel,  
Bike tirbê bê ecel.  
Lelam bûye hostê min,  
Pêşik daye destê min.

Dizî ruhe seva me,  
Tev şîr çûye devê me.  
Pirr mekevin mitala,  
Rind gotine bav-kala.

Şivîn şivdar hildanê,  
Se titirse lêdanê.  
Ew direve dûrkeve,  
Şivdar li wê nekeve.

Çiqas bike kaste-kast,  
Çerxê dize nabe rast.  
Helbest bona xelatê,  
Weke bejna çerxê tê.

Tiştê kû bû emanet,  
Jêra nakin xeyanet,  
Emanetra xeyanet,  
Dikin jinê bê hurmet.

Qadir Motî, sed bejê,  
Çerxê pêşik navêje.  
Wêra tenê jor xwedê,  
Belê, xetê zû bidê.

## DURÛ, DEXES, ÇAVNEBAR

Rûda dost, yar, kardarin,  
Piştâ tirbkol, xedarin,  
Bê îtbarin, dilsarin.  
Durû, dexes, çavnebar.

Bal wan rastî tunene,  
Ew bal kêbin, wir şîne,  
Yek ji yekê namîne.  
Durû, dexes, çavnebar.

Qilbiz, bi fen, bi lêlin,  
Quncikada ditelin,  
Boy deng-hesa guh belîn,  
Durû dexes, çavnebar.

Çînê bilind hez dikin,  
Ber çîn piştan kûz dikin,  
Bona cerdê viz dikin.  
Durû, dexes, çavnebar.

Ling hestene, dest kêrin,  
Boy şel dibêñ ew mîrin,  
Mêr nebûnê, wek şêrin.  
Durû, dexes, çavnebar.


Ew îblîsin, ne gêjin,  
Pirsên xerab dibêjin,  
Qetilê lez-bez dipêjin,  
Durû, dexes, çavnebar.

Ew şerm nakin, ar nakin,  
Keda helal kar nakin,  
Para heram çar dikin.  
Durû, dexes, çavnebar.

Wana ci dît dixwezin,  
Nedanê bi gazinin,  
Ew qencîyê nizanin,  
Durû dexes, çavnebar.

Cîranê wan ci tînin,  
Nişkêva ew bibînin,  
Nekesara dîghînin.  
Durû, dexes, çavnebar.

Qadir dibê ew pirin,  
Ew yemanin, ew dirin,  
Her ci dibêñ tew virin.  
Durû, dexes, çavnebar.



# RÛMET GİRTİN

## HÊYDER CAN

Tune wek te merd, mérxaş,  
Çê serkarî, Hêyder can.  
Rê zaneyî, ewlyayî.  
Pêxemberî, Hêyder can.

Jorê ser me wek tavî,  
Jêrê hewa, him avî,  
Mera bira, kal bavî,  
Tim sitarî, Hêyder can.

Bijî tac û bextê te,  
Êl rehete wextê te,  
Bext nagêje bextê te,  
Bi îtbarî, Hêyder can.

Ala rengîn te bakir,  
Azerbaycan te rakir,  
Milletê lê tew şâ kir,  
Bê hinberî, Hêyder can.

Gence, Taliş-Mûxanê,  
Bakû golla şer, xwînê,  
Red kir şerê navgînê,  
Sîng sîperî, Hêyder can.

Kan-sîyaset bal teye,  
Fem-fereset bal teye,  
Xêr-bereket bal teye,  
Bextewarî, Hêyder can.

Zanegîne serê te,  
Boy millete kara te,  
Zar nagêje zarê te,  
Zar pergarî, Hêyder can.

Azerbaycan berêda,  
Te xistîye karêda,  
Şukur kontrakt girêda,  
War bi zêrî, Hêyder can.

Welat ya me, nift ya me,  
Kontrakt ya me, mift ya me,  
Parek ya wan, heft ya me,  
Hukumdarî, Hêyder can.

Nav ulumada pijayî,  
Rast-rênişa dewrayî,  
Dîrokê tu xas dayî,  
Kaw-kubarî, Hêyder can.

Lîsabonê sammîtê,  
Rêça te kir civatê,  
Ji dil xweşa tewa tê,  
Azadarî, Hêyder can.

Te wir şer, dew eyan kir,  
Xayîn, xedar nîşan kir,  
«Vêto» danî dîwan kir,  
Tu serdarî, Hêyder can.

Laçin, Şüşa - Qerebax,  
Ber çavê me kirin dax,  
Wextê dayîk dikin ax!!!  
Dil sed parî, Hêyder can.

Qir û qetla Xocalî,  
Hêsîr birin çend alî,  
Boy şehîda dinalî,  
Cegar parî, Hêyder can.

Xwezla ew roj bihata,  
Neyar bê şer derketa,  
Qadir helbest bigota,  
Tu ruhdarî, Hêyder can.

## NIVÎSKARO, BIRAKO

*Rewayî nivîskarê kurdayî  
bi nav û deng Ahmedê Hepo dikim*

Nivîskaro, birako,  
Bi nîzamo, pir-pako,  
Bav-kalê me li bal hev,  
Tim erdekê jîne tev.

Wî qirarî em dîsa,  
Ji bîr nakin pak-pîsa.  
Boy gel timê sitarî,  
Tu xêrxwezî, kardarî.

Kî tê bal te bi gazin,  
Vegerînê hal sazin.  
Tu gel ji dil hez dikî,  
Jerbe tev wan gez dikî.

Tu li jorê wek tacî,  
Rojên dijwar îlacî.  
Tera pir bû ax, keder,  
Te şehid dan bê hinber.

Bê miraz tu dax kirî,  
Bi mital, bi ax kirî,  
Vê dewranê zulma ha,  
Firote te zef baha.

Ruhistîn jî natirse,  
Ahal-cahal napirse.  
Feleka kor zef zore,  
Tu kes bi wê nikare.

Xwedê li te bê rehmê,  
We şa bike her demê.  
Tu û Seyran, tev bûkan,  
Rind mezinkin biçûkan.

Ew gulên ber bîna we,  
Aqil, rindin mîna we.  
Nevî sebrin, şîrînin,  
Lema ezîz dîmînin.

Wetenê me azabe,  
Dilda ofa me nabe.  
Emê bîr kin derd, kulan,  
Bibin mîna bilbilan.

Def-dewata Nîyazî,  
Lêxin bi sed awazî.  
Deng û hesê vê şayê,  
Bibe dengê azayê.

Li Çizîrê nav Bota,  
Govend, reqsa keç-xorta,  
Me li welêt bidîta.  
Dibek ev jan derketa.

Te boy welat her çikir,  
Ber çavane tew şukur.  
Te nivîsî «Bawerî»,  
«Birînê» kir hewrî.

Te da gelan dildarî,  
Herd jî weşand dijwarî.  
«Dengê kurd» ew rojname,  
Cara ewlîn te da me.

«Bi gazinim» ya Motî,  
Elîfba bi hesretî.  
«Kuda herim» ya Barî.  
Axavtin bi Azerî.

Bername jî radyo jî  
Te ruhbekir sed bijî.  
Ji xedaran çend pirsa,  
Ezê bêjim ha dîsa.

Kê pir dikir horte-bort,  
Wana dîyar, êl firot.  
Rûda heste, binva kêr,  
Rûvî pişda dibûn şêr.

Hinek bendê qaf texte,  
Bibûn alim li rex te.  
Hema ji te dûr ketin,  
Xwe litimîn kûr ketin.

Kî rûspîya nabîze  
Ewa paşê dikûze.  
Bê mezin, bê bav, millet,  
Tu wext nebû ew dewlet.

Kurdên kurda dûr diçe,  
Nele lêbe ew hêçe.  
Bendê êlax davêje,  
Ew ewtere, yan gêje.

Kî ku eslêx bîr dike,  
Xwera tribê kûr dike.  
Kurdên kurdî nizane,  
Dilva kurdbe bi şane,

Kurdên dilva kurd nîne,  
Wîra kefen zû bîne,  
Welat rabe! Ha nabe!  
Ji neyar zû azabe.

Nexwaşî dest nakşîne,  
Berbi axê dikşîne.  
Janek dide dilê min,  
Sêfil dike halê min.

Êşek digire serê min,  
Tam dibire zarê min,  
Dibek pêra negînim,  
Hesret dilda bimînim,

Minet dikim wê çaxê,  
Tu melhemke vê daxê,  
«Menal, dilo», rast îro  
Dernayê ji dil şev-ro.

Kitêba min neweşe,  
Wir jî dilêm wê bêše.  
Ew boy millet heware,  
Ji wê gul-nûr dibare.

Tu birayî, bi bextî,  
Sêfil nebî tu wextî.  
Ahmed, êlhez bi şanî,  
Nav-nişana dewranî.

## SOHRAB TAHİR

Rewayî helbestvanê gel, yê  
Azerbaycanê Sohrab Tahîr dikim

Azerbaycan tim yare,  
Mera dîyar, sitare.  
Ew meskenê ner-şêran,  
Bedew rindî ez heyran.

Nivîskarî, him şayîr,  
Xweş Kurd hezî, tu Tahîr.  
Tû birayê helalî,  
Mîna kanya zelalî.

Ziman, birûsk, qelem şûr,  
Jê dibare gul û nûr.  
Kurdistana mezinda,  
Kurdêm dikan gazinda.

Mehmed Qazî can danî,  
Pîşeverî-şêr kanî?  
Mêrxas Azer, Kurd Îzet,  
Wana dîtin pirr zehmet.

Kurd-Azerî du bira,  
Tev ketine dest gura.  
Dest bidine destê hev,  
Rojên, dijwar rabin tev.

Tu Şehrîyar, ez Goran,  
Ser me zef bû berf, baran.  
Tu wek Hejar êl hezî,  
Weten hezî, gel hezî.

Nêta me ku bê sêrî,  
Îdî nabin gûl cêrî.  
Ji dest neçe cî-miskan,  
Hevra bibin pişt, guman.

Ewan dewrê giranda,  
«Nama keça cîranda».  
Pesnê kurdan te daye,  
Îtbar, bawar bal teye.

Necilmise rengê min,  
Tu deng bide dengê min.  
Ezê îro xwe bakim,  
Govend herim te şakim.

Boy eşqa te tim şame,  
Te maç dikim ez hame.  
Şukur xortî, ne kalî,  
Dilê minda cahalî.

Destêx bide destê min,  
Tev bilîzin dostê min.  
Ev kilamê xweş, bi deng,  
Ezê bêjim eşq û şeng.

«Neynûkê» zef şirîne,  
«Papûrê» jê namîne.  
«Sêpê», «Qaz-gaz», «Koçerî»,  
Dike eslan, şêr mîrî.

Wek kulîkê baharan,  
Bixemlinin dîyaran.  
Welatê me azabe,  
Kul-derdê me ta nabe.

Yeke wê bê ew zeman,  
Qadir dijî bi guman.

## XOSROV BEG

Xosrov begê bi nav-deng,  
Dostê bendê jar, dest teng.  
Rezê darê ji darê,  
Dûr naeve tu carê.

Xasin bav û kalê te,  
Çeye eslê xalê te.  
Diçî rîya kal-bavan,  
Bilind dikî wan navan.

Tu wê rîyê ber dikî,  
Direj dikî, der dikî.  
Dibî welêt nav gelan,  
Bal dosta, bal hevalan.

Ew rê kurdan radike,  
Pêşda dibe, şadike.  
Tu darpiştî, sitarı,  
Him gumanî, kardarî.

Bi îtbarî, bi bextî,  
Lema îro ser textî.  
Gulbî, geşbî, tim şaxbî,  
Necilmisî bê axbî.

Milletê me sêfile,  
Bê dewlete, lal-dîle.  
Bela bûne dîyaran,  
Ketne destê neyaran.

Destê meda-cot, şivdar,  
Bê ulm nabe kurd serdar.  
Qelem, kitêb, ruh-qewat,  
Ezê bidim geş kî hat.

Wê misqalê kî hilde,  
Bal wî zanbûn bilinde.  
Kitêba min naweşe,  
Kerba dilêm kûr dêşe.

Ewe tema davê min,  
Nûr-şemala çavê min.  
Wêda melek razane,  
Kî wan rake ewlyane.

«Menal, dilo » biweşe,  
Mîna kewa bimeşe.  
Xelata wê bişîne,  
Bide Tahar zû bîne.

Bira derdem belabe,  
Ruhêm şabe, qelabe.  
Qadir bêje helbestan,  
Bigerînin ser destan.

Xosrov begê çê nav-deng,  
Birê bendê jar dest teng.  
Her tim xaşbe halê te,  
Eşq û şabe dilête.

## ÇİL SALYA TE PİROZBE

Çil salya te pîrozbe,  
Nav roja te bê dozbe.  
Heval, hogir civyane,  
Boy eşqa te tew şane.

Tu ezîzî Elesker,  
Bext mirazî seraser.  
Êl dizane xêrxwazî,  
Li esmanan wek bazî.

Dostperestî birayî,  
Nûra çavêm çirayî.  
Ji bîr naçî her seet,  
Bê te nabe dil rehet.

Mital meke ez dûrim,  
Bi dil, ceger ez wirim.  
Ev dil hezî xelate,  
Daye minda xalê te.

Nisla dê û bavê me,  
Bilind dike navê me.  
Rev-bez rojê reş, tarî,  
Nehîşt bijîn dilbarî.

Mera nefî bû parda,  
Dijmintayî hat serda.  
Derd, kul, nalîn, zare, zar,  
Bû para me jera mar.

Bela kirin dewletan,  
Hewcî bûne milletan.  
Nefî, kela, mîr kuştin,  
Derbe, dûrbe ne tiştin.

Tiştê ku nan dibire,  
Ewî qet şûr nabire.  
Mil bidine milê hev,  
Xosrov begva rabin tev.

Hev hemêzkin xwe bakin,  
Cot bigerin gel şakin,  
Hûn mîrxasin, delalin,  
Mîna ava zelalin.

Nêt-meremêm bê sêrî,  
Millet nabe qûl, cêrî.  
Kurdistan zû azabe,  
Hesreta me ta nabe.

Haye nêta bendê xêr,  
Kes nebîne zulma şêr.  
Pêncî salya emrê te,  
Def-dewata kurê te.

Xwezla herne Kerkûkê,  
Ji wir bînin em bûkê.  
Tu Nazêva ges-şabin,  
Kal-pûr nebin tim habin.

Herd gulê ber bîna we,  
Bedew, rindin, mîna we.  
Zarînê zef şirîne,  
Zaûr ji we namîne.

Necilmisin gulê me,  
Aza bijî gelê me.  
Ew roja zûbihata,  
Qadir Motî bigota.

Dewleta me pîrozbe,  
Welatê me bê dozbe.

25.04.96 salê

## CEJNA NEWROZ

Pêparê te anî bahar,  
Heland berf, qeş, erd bû hişyar,  
Xemilîn bax, best û beyar,  
Gul-gulistan wek cinetî,  
Cejna Newroz tu xêr hatî.

Tu baharî, him sitarî,  
Dost û yarî, tim kardarî,  
Şewqê didî cîyê tarî,  
Gul-gulistan wek cinetî,  
Cejna Newroz tu xêr hatî.

Agrê Kawa şemal danê,  
Eşq û şayî anî dunê,  
Deşt û zozan kire xinê.  
Gul-gulistan wek cinetî,  
Cejna Newroz tu xêr hatî.

Şemala te şên kir dîyar,  
Dest Dehokê xedar, xwînkar,  
Te aza kir welat, jin, zar.  
Gul-gulistan wek cinetî,  
Cejna Newroz tu xêr hatî.

Welat jare destadaye,  
Alîkarî ji te maye.  
Ruhê Kawa li bal teye,  
Gul-gulistan wek cinetî,  
Cejna Newroz tu xêr hatî.

Zulmê daye kurd digirî,  
Ber vê zulmê tê bigirî,  
Dîsa vêxe wî agirî,  
Gul-gulistan wek cinetî,  
Cejna Newroz tu xêr hatî.

Ba-birûskê birq vedanê,  
Keskesorê kon lêdanê,  
Nûr-şemdanê tînî dunê,  
Gul-gulistan wek cinetî,  
Cejna Newroz tu xêr hatî.

Keç, bûk mînan qaz, qulingan,  
Neqişîne bi sed rengan,  
Govend, fiq-saz, deng ser dengan,  
Gul-gulistan wek cinetî,  
Cejna Newroz tu xêr hatî.

Xuhe-xuşa cem-kanîyan,  
Ber beroja keryê mîyan,  
Rewşê dide nexşê çîyan.  
Gul-gulistan wek cinetî,  
Cejna Newroz tu xêr hatî.

Tavê germ kir erd û esman,  
Boy kulilkên dora çeman.  
Mêşen hingiv nadin eman,  
Gul-gulistan wek cineti,  
Cejna Newroz tu xêr hatî.

Tu şâ dikî dost û yaran,  
Li hev tînî evîndaran,  
Cîran hevra dibin paran,  
Gul-gulistan wek cineti,  
Cejna Newroz tu xêr hatî.

Pelawa ser newiz kirî,  
Gûz, findiqê çerez kirî,  
Hezar mêvan veke dêrî,  
Gul-gulistan wek cineti,  
Cejna Newroz tu xêr hatî.

Qadir, beza kar, xezalan,  
Ref û rêzê kew-bilbilan,  
Zêde dike huba dilan,  
Gul-gulistan wek cineti,  
Cejna Newroz tu xêr hatî.

## FERÎDE

Bê hinbere nevya min,  
Gul-rihane Ferîde.  
Dev bi kene, kevotke,  
Gul-cahane Ferîde.

Ewa horî, perîye,  
Qirik tijî morîye,  
Nûre jorda barîye,  
Nûr-şemdane Ferîde.

Malda bi rik deng bûnê,  
Mitalê min teng bûnê,  
Qet hez nake ceng bûnê,  
Dil dermane Ferîde.

Carna xurek rêtinê,  
Nişkêva min dîtinê,  
«Bavo»-«bavo» gotinê,  
Dîn îmane Ferîde.

Wê nebînim har dibim,  
Bê miskan, bê war dibim,  
Carna sêva par dibim,  
Zar-gumane Ferîde.

Qadir, çikla dara te,  
Xwedê kirye para te,  
Pîrik, xûşke kara te,  
Sed ruhane Ferîde.

## TEBERİK

Nav kalike, xwe kurik,  
Minra bûye teberik.  
Wextê minî ahalda,  
Ez kirime cahalda.

Esrafile navê wî,  
Helbestvane bavê wî.  
Ew dîtînê şâ dibîm,  
Bi eşq ji cî radibim.  
Wî maç dikim têr nabim,  
Hewas tê min şêr dibim.  
Xwezla ew roj bihata,  
Esrafîlêm bigota.

Qelem, defter bistîne,  
Têke çente zû bîne.  
Ezê herme mektebê,  
Rind bixûnim kitêbê.

Nêtam ewe ev tifal,  
Xweşhal bibe sal bi sal.  
Kurêm bi eşq mezinbe,  
Nahêlim bi gazinbe.

Emrêm, ruhêm, birê min,  
Dewsgirê min, kurê min.  
Dilda nebe ofa me,  
Ezê şenkim baxê me.

Herder bikim bax, bostan,  
Welat bibe gulistan.  
Gulên reng-reng biçînim,  
Boy şehidan bişînim.

Zû azabe Kurdistan,  
Kurêm bêje helbestan.  
Qadir dijî bi guman,  
Berbi me tê dewr-zeman.

## ROJNAMA «DENGÊ KURD»-RA

Ser sera û ser çavan,  
Tiberika kal-bavan,  
Tu me şake her gavan,  
Fesal lêde cenga kurd,  
Ez bi heyran «Dengê Kurd».

Dengê teyî mîna şûr,  
Hiv û roya bê qisûr,  
Şewqe bide gelîyê kûr,  
Fesal lêde cenga kurd,  
Ez bi heyran «Dengê Kurd».

Mizgînîya Yekbûnê,  
Mîna baqê sosinê,  
Bigerîne li dunê,  
Fesal lêde cenga kurd,  
Ez bi heyran «Dengê Kurd».

Hejmara te pîrozbe,  
Yekbûna me bê dozbe,  
Welat hezbe, êl hezbe,  
Fesal lêde cenga kurd  
Ez bi heyran «Dengê Kurd».

Eşkerî dengê aza,  
Bû dara bext miraza,  
Lêxin tenbûr, fîq, saza,  
Fesal lêde cenga kurd  
Ez bi heyran «Dengê Kurd».

Aqilbendê pir kemal,  
Daçêkîrin mal û hal,  
Rewşa dide dunya kal,  
Fesal lêde cenga kurd,  
Ez bi heyran «Dengê Kurd».

Bendê bê kes, bê guman,  
Bê ci, bê war, kor, nezan,  
Bidê, himke zar-ziman  
Fesal lêde cenga kurd  
Ez bi heyran «Dengê kurd».

Ew qanûnê şâşe, feş,  
Zulma tarî roja reş,  
Eşkerîyê kire geş,  
Fesal lêde cenga kurd;  
Ez bi heyran «Dengê Kurd».

Gellek mervên dil xedar,  
Ber te bûne tengezar,  
Mera bilbil, him bahar,  
Fesal lêde cenga kurd,  
Ez bi heyran «Dengê Kurd».

Kew, kewvotka zozana,  
Meleka li esmana,  
Bijî dewr û zemana,  
Fesal lêde cenga kurd,  
Ez bi heyran «Dengê Kurd».

Çanda meye razayî,  
Li Bakûyê azayî,  
Dîrokê dît «Ronahî»,  
Fesal lêde cenga kurd,  
Ez bi heyran «Dengê Kurd».

Mera dihol, dewatî,  
Gulistana cinetî,  
Qadir dibê xêr hatî,  
Fesal lêde cenga kurd,  
Ez bi heyran «Dengê Kurd».

## DOSTÊ MİN

*Rewayî hclbcstvanê cyan  
Şamil Eskerov dikim*

Boy eşqa te dostê min,  
Dinîvise destê min,  
Qelem, defter, rûh qewat,  
Te par daye, hostê min.

Dîrok, çanda me kurdan,  
Ber van zulman, kul derdan,  
Te kire gul, gulistan,  
Dewlemend kir, lel, dur dan.

Pewirvanê bê hurmet,  
Bendê xayîn, bê xîret,  
Nehîştin tu per vedî,  
Bi dilbarî û rehet.

Ked-hed, Laçin, Kelbecer,  
Zîyaretê bê hinber,  
Dijmin zeft kir dax da me,  
Şînê dike êl, dor, der.

Kitêbxana mala te,  
Maldîroka êla te,  
Te xulqand neyar bir,  
Niştir dane dile te.

Çift, refesêneyaran,  
Kezev kirin sed paran,  
Ji Wetenê kal-bavan,  
Emê derxin xedaran.

Qadir dibê hîvîke,  
Derdan minra nîvîke.  
Dewran dore ha naçe,  
Tu tim xwaşbe avake.

## KEÇÊM

Gellek êgin, zef bedewin,  
Mîna sêva sorin keçêm,  
Xwezginîya hevra dewin,  
Wek çerezên parin keçêm.

Werdek, Rihan, Fazileye,  
Nûrane û Cemîleye,  
Xalide û Nazîleye,  
Hiv, tav nûra dorin keçêm.

Li esmana tew melekin,  
Mina kewê per belekin,  
Dor kanîya sûravêlkin,  
Heft sitêrkê jorin keçêm.

Karê xweda pêşda sazin,  
Dîya wana nake gazin,  
Cahal, ter-can, ber mirazin,  
Zêrin, lelin, durrin keçêm.

Avê tînin dişon fera,  
Malê devra, baxçe pêra,  
Vedwejêrin xwera-xwera,  
Ji şer-dewa dûrin keçêm.

Qadir divê keçêm gulin,  
Wek horîyan dimilmilin,  
Pirr loxmanin, huba dilin,  
Neyaranra sarin keçêm.

## DOSTÊM EGÎT

Rewayî helbestvan  
Egîte Qadirî dikim

Zarê wî zêr, karîbare,  
Ji qelemê nûr dibare,  
Him şâire, him dersdare,  
Şâîr, dersdar dostêm Egît.

Helbestvanê dewrê, zemîn,  
Vedke sêra erşê esmîn,  
Milletaran bûye emîn,  
Şâîr dersdar dostêm Egît.

Bal wî xezna lel-dur heye,  
Ji Feqîyê Teyran maye,  
Tebîyetê tenê daye,  
Şâîr, dersdar dostêm Egît.

Nav-nîşanê merdan bale,  
Xêrxwezekî bê zewale,  
Gilîyên wî pirr kemale,  
Şâîr, dersdar dostêm Egît.

Qelema wî nade mecal,  
Mîna şûrê Rostamê Zal,  
Nemerd, xayîn kire betal,  
Şâîr, dersdar dostêm Egît.

Beyt, qezelê wî delalin,  
Sosin, rihan, gulê alin,  
Nêt meremê kurdan balin,  
Şâîr, dersdar dostêm Egît.

Huba wî kurd, Kurdistane,  
Nav êlêda pirr eyane,  
Navê wî ma dewr-zemane,  
Şâîr, dersdar dostêm Egît.

Qadir, Egît qedir zane,  
Ulmê xweda xezne-kane,  
Camêrekî nav-nîşane,  
Şâîr, dersdar dostêm Egît.

## NAVÊ TE MA ZEMAN-ZEMAN

*Rewayî nivîskar, helbestvan  
Elîyê Evdilrehman dikim*

Navê te ma zeman-zeman,  
Can Elîye Evdilrehman.  
Êla mera bûyî gûman,  
Can Elîyê Evdilrehman.

Her wext gula meclîsanî,  
Te gelara şabûn anî.  
Navê te ma zeman-zeman,  
Can Elîyê Evdilrehman.

Mera bûyî bav û bira,  
Lema em tew dibêñ hevra.  
Navê te ma zeman-zeman,  
Can Elîyê Evdilrehman.

Tu Nîzamî, Ehmed Xanî,  
Mera her tim Cegerxwînî.  
Navê te ma zeman-zeman,  
Can Elîyê Evdilrehman.

Kitêba te «Şer li çîya»,  
Şîrovedke mîna dîya.  
Navê te ma zeman-zeman,  
Can Elîyê Evdilrehman.

Qurne, dewran, te bîr nake,  
Kurdistan te raçav dike.  
Navê te ma zeman-zeman,  
Can Elîyê Evdilrehman.

Şâîr ewe nav-deng heye,  
Nav dengê te gelra maye.  
Navê te ma zeman-zeman,  
Can Elîyê Evdilrehman.

Qadir pirsî gellek kala,  
Nav dimine milyon sala,  
Navê te ma zeman-zeman,  
Can Elîyê Evdilrehman. !

## ROJNAMA «DÎPLOMATÊRA»

Yek salîya te pîrozbe,  
Welêt şenke, «Dîplomat».  
Bigre ala azayê,  
Bilind bake, Dîplomat.

Qelema wek şûre,  
Rojname bê qisûre,  
Sîyaset jê dibare,  
Elê rake, Dîplomat.

Dijminê me har pirrin,  
Xwedan dewlet zor hurrin,  
Bi ulm wana bikirin,  
Zanbûn pake, Dîplomat.

Kurdîstanam bê çare,  
Jorda agir dibare,  
Îro welat çar pare,  
Sînor yekke, Dîplomat.

Bona zu bê azayî,  
Yekbûn tunê dîl mayî.,  
Rake bendê razayî,  
Çare bike, Dîplomat.

Mêrxasê çê Barzanî,  
Boy azayê can danî.  
Tu dîroka dewranî,  
Xebat bike, Dîplomat.

Here derê welatan,  
Bêje xwedan dewletan,  
Bidin heqqê milletan,  
Qadir şake, Dîplomat.

## CİXARE

Der-çirano, gidîno,  
Bê kirdare, cixare.  
Di ser çoka ez xistim,  
Hukumdare, cixare.

Ew gemara, ne tuştê,  
Har xedara, gel kuştê.  
Wek şerbetê min xweş tê,  
Parsixare, cixare.

Ne şivdare, ne singe,  
Jera mare, ji belge,  
Ew tifinga bê denge,  
Zulumkare, cixare.

Bi şîn-girî dibêjim,  
Ew nahêle, pîrr bijîm,  
Ez nikarim bavêjim,  
Xwin xedare, cixare

Şev ranazêm, axdikim,  
Kuxte-kuxtim terk nakim,  
Nefes nayê, çi bikim,  
Hundurxare, cixare.

Qamet xarkir, pişt nehîşt,  
Can-cesed bir, goşt nehîşt,  
Dil-hinav xar, tişt nehîşt,  
Kemendare, cixare.

Bîn kotîya, bê hurmet,  
Bal min nehîşt, rû-rûmet,  
Qadir kire, bê qîymet  
Wek neyare, cixare.

## NAZÊ

*Bona keçika xwe-Nazê*

Nazê, Nazam, Nazdarê,  
Qewmparêza dildarê,  
Nazam, naza bi kese,  
Bi êl, obe, bay xase.

Nazam devken, delale,  
Ezîze, şîrhelale,  
Nazam rinde, bedewe,  
Gula gundê me ewe.

Wek şekirê nebatê,  
Şîrîn xweşa tewa tê,  
Heyfê Nazê dûr çûye,  
Nav-dengê wê vir maye.

Bavê Nazê kal bûye,  
Nexweşe, bedhal bûye,  
Nazê, Nazam, Nazdarê,  
Sal buhurîn tu ware.

Xwizila ew roj bahata,  
Min Naz, Nazax bidîta,  
Gilî-gazîn bigota,  
Dibe ev êş derketa.

Çavêm rîya qerimî,  
Kerba dilêm werimî,  
Qadir dibê Nazdarê,  
Ez kerîbîm zû nerê.

## HESRETA MİN

Bi zaravê pîrika Nergîz

Tîyêm Husen sed bijî,  
Îslam bal wî pak dijî.  
Ewî gellek cefa dît,  
Kurêm lema şefa dît.

Îslam, Xatê mîr-jinin,  
Alma-Atê dimînin.  
Keça wana Dîlane,  
Dîlan mîna gulane.

Hesreta min serî girt,  
Çavên kurêm dunya dît.  
Dîlana min delale,  
Raçav dikîm heft sale.

Îslam, Xatê helalîn,  
Mîna ava zelalin.  
Bûkam Xatê ezîze,  
Bi hewas min dibîze.

Zef şâ dibim ez pîrik,  
Minra bûye teberik.  
Ewe tema devê min,  
Nûr-şemala çavên min.

Dîlana min bedewe,  
Dîn-îmana min ewe.  
Pir xaş dike halê min,  
Melhem dibe dilê min.

Nêtam ewe ev tifal,  
Xaşbe, geşbe sal bi sal.  
Qadir tu jî boy dostan,  
Binîvîse helbestan.

# NAVEROK

## I

ÇAVKANÎYA ZELAL ----- 3

## WETENHİZÎ, MÊRXASÎ

1.Kurdistan-----	6
2.Ez diçime Kurdistanê-----	9
3.Kurdno, rabin war diçe -----	11
4.Seva kurdan zulimkarin-----	14
5.Em xulamê bê parin -----	21
6.Hey Kurdistan -----	24
7.Rê-dirb -----	27
8.Rabe, rabe şêr Barzanî -----	28
9 Bahar were, bahar were -----	30
10.Çima gazinî -----	34
11.Agrê Kawa-----	35
12. Tu kes şera nebîne-----	37
13. Ya li me bû kesî nebû-----	38
14. Qerebaxê-----	41
15. Laçinê -----	42
16. Nedne dijmin Kelbecerê -----	43
17. Mêrxasên kurdan -----	45
18.Loxmanê mezin -----	48
19. Erezo, rê bide -----	51

## II

## MENAL, DİLO

1. Dunyayê -----	54
2. Li vê dinê -----	55
3. Dilêm-----	58
4. Hîşt felekê -----	59
5. Hat-çû -----	60
6. Kal bûm -----	61
7. Minra nayê -----	63
8. Bextêm -----	64
9. Ax, felekê, tu belabî -----	65
10. Hewar hayê -----	66
11. Sêwîtayî-----	68
12. Belengazî -----	69
13. Mervê nemerd -----	70
15. Dayka delal -----	72
16. Werê bibe bermalîya min -----	74
17. Ax dêmarî, dêmarî -----	76
18. Weysetê min -----	77
19. Menal, dilo -----	79
20. Kurêm diçe -----	93
21. Dirav dike -----	94
22. Nayên -----	95
23. Nema-----	96
24. Destêm-----	98

25. Hêdî-hêdî-----	99
26. Ez nizanim dîyam kîye-----	100
27. Bilbila dengbêj -----	102
28. Merivê nezan -----	108
29. Vê dewranê -----	109
30. Seyê havî -----	110
31. Kurêm -----	111
30. Mezin nebe -----	112

### III

## HUB-HİZKİRİN

1. Werê -----	116
2. Weynin -----	117
3. Şaîr -----	118
4. Werê baran-----	119
5. Evan çavan -----	120
6. Bext mirazêm, Tehmîne -----	120
7. Por zerê -----	121
8. Keç-bükê kurdan -----	122
9. Te xezalê -----	124
10. Xêliya bûkê -----	125
11. Cînarê-----	127
12. Bê yar meke -----	129
13. Delal meçe -----	131

14. Nehat -----	133
15. Werêñ îro dewate-----	134

## IV

### KENÊ BER GİRÎ

1. Rinda malam -----	137
2. Derdê bûkam girane-----	142
3. Mal ya mine, tu kîyî -----	144
4. Jinê vizek -----	146
5. Jinê hêwî -----	147
6. Ez mame jêrê-----	148
7. Xesî û bûk -----	152
8. Gazinê bûkê -----	158
9. Mêrê kotî -----	160
10. Qerso -----	162
11. Çerxê -----	164
12. Durû, dexes, çavnebar -----	167

## V

### RÛMET GİRTİN

1. Hêyder can -----	171
2. Nivîskaro, birako -----	173
3. Sohrab Tahîr-----	178

4. Xosrov beg -----	180
5. Çil salya te pîrozbe-----	182
6. Cezna Newroz -----	185
7. Ferîde -----	187
8. Teberik-----	188
9. Rojnama «Dengê kurda»-ra -----	190
10. Dostê min -----	192
11. Keçêm-----	194
12. Dostêm Egît -----	195
13. Navê te ma zeman-zeman -----	196
14. Rojnama «Diplomat»êra-----	198
15. Cixare-----	199
16. Nazê -----	200
17. Hesreta min -----	202



**PDF:**

# **Enstituya Kurdi ya Qefqasyayê**

**Web:**

<https://www.ensiklopediyakurdi.com/>

**Tel.:**

+7 918 073 48 79

